


Sal:2 Hejmar: 78 15-21 Tebax 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

*Pêkutiyên li ser  
Özgür Gündem'ê  
didomin, niha jî  
Aysel Malkaç  
winda ye*

*Rûpel 9*



# Germa hilpişkîna 15'ê Tebaxê

*Rûpel 8*



Ji destpêka meha Tebaxê ve bandora (tesira) 15'ê Tebaxê roja hilpişkîna şerê çekdarî, bi êrişen gerilla yên ser qereqol û tabûran xwe nişan da.

## NIRXÊN 15'Ê TEBAXÊ

Me gelek cejn derbas kirin/  
Li ser çiyan/ Tî û birçî/ Em  
gelek cejn jiyan/ Li pişt têlê  
rêsayî/ Di zîndanan de/ Me  
gelek cejn dît/ Li diyarê mi-  
rinê/ Lê belê min qet nedît/  
Wek 21'ê Adarê lîvok/ Wek  
15'ê Tebaxê germ.

*Rûpel 12*



## KONTRGERILLA ENDAMÊ YDK'Ê KUŞT

Mele Muhyettîn wek welat-  
parêzek di nava dîndarêne Kurd  
de xwedî cihekî bi rûmet bû.  
Endamên kontrgerîla ew di mala  
wî de qetil kirin.

*Rûpel 3*



# Kontrgerîla endamê YDK'ê kuşt

**Navenda Nûçeyan-** Yekîtiya Dîndarên Kurdistanê (YDK) bi belavokekê kuştina endamê xwe yê Komîteya Navendî Mele Muhyettîn Taştekîn a ji aliyê kontr gerîla ve protesto kir.

YDK, di belavoka xwe ya bi mîjuya 11.08.1993' yan de balê dikişne ser rengê komara Tirk ku di dîrokê de ci anîye serê gelê Kurd û bi ci awayî gel tevî welatê wî di bindestê xwe de hiştîye, bi rengê İslamiyete çawa gel dixapine.

Di belavokê de dixuyînin ku ew dê bidin ser şopa Şêx Seîd û hogirên wî, YDK; "Li hember komara Tirk şerkirin, ev rî ye, riya ku Şêx Seîd vekiriye ye. Ev rî wê bibe riya me jî." dibêje.

Yekîtiya Dîndarên Kurdistanê di dawîya belavoka xwe de bang li gelê Kurdistanê dike û ji malbata kuştî re serxweşiyê xwe pêşkêş dike.

Mele Muhyettîn Taştekîn di 05.08.1993'yan de li gundê Anzarê ku li ser navenda bajarê Muşê ye, saet li dora 21.30-22.00'ê şevê ji aliyê kontrgerîla ve hatibû qetikirin.

Pireka Mele Muhyettîn bûyera kuştinê wiha tîne ziman: "Mele ji Almanyayê nû hatibû, gelek mirov dihatin serdana wî. Evarê saet li dora 21.30-



Mele Muhyettîn, di dema hilbijartînên meclisa neteweyî de bi komek rewşenbîrîn Kurd re tê dîtin. (Yê bi kum)

22.00'ê şevê, 4 kes hatin û xwe wek heval dan naskirin.

Piştî sohbetekê şüye (mîrê) min ji bo "Me divê bi te re em bipê-yîvin" xwestin derxin derve. Ji ber ku şik gihadê, me nexwest derkeve. Piştî xire cirekê dudo jê bi milen min girtin û şüye min bi zorê derxistin der. Çend pê ji malê dûr ew kuştin. Ez li dû wan cûm, lê min şopa wan winda kir. Hêzên dewlete saetek nîv bi şûn ve hatin cihe bûyerê. Şûye min mirovek welatparêz bû. Gelek dihat hezki-

rin."

Mala Mele Muhyettîn ji ber cûnehetâ kesen ku tê serxweşiyê xalî nabe. Tê gotin ku ta niha ji 5 hezâr bêhtir kes hatine hewariye (taziyeyê).

Endamê Komîteya Navendî ya Yekîtiya Dîndarên Kurdistanê Mele Muhyettîn Taştekîn li medreseyen Kurdistanê xwendibû, li ser dîroka Kurdistanê xebatên lêgerîn û lêkolînî pêk dihanî, li Almanyayê ji şeridek (qasetek) bi navê "Îçihada İslâmî" derxistibû.

## Kongreya giştî ya 11. a PDK'ê

**Navenda Nûçeyan-** Roja 16'ê Tebaxê Partiya Demokrat a Kurdistanê Kongreya xwe ya Giştî ya 11. Li bajarê Sellahedînê li dar dixe. Di vê kongreyê de tê hêvîkirin ku PDK bi rêxistina Yekgirtin re bibe yek û Serokê Yekgirtinê Samî Evdurrehman bibe Ali-karê Serokê Giştî yê PDK'ê. Kongreya 11. li Qesra Berzanî ya li Selahedînê dicive.

Di vê kongreya ku gelek berpirsiyaren ji partiyen Ewrûpî û yên Tirkîyeyê besdarî din de, bi giranî li ser pirs-girêkîn aborî yên Dewleta Federa ya Kurdi tê rawestin. Kifşkirina pêkanina sistema dravî ji, di rojeva kongreya 11. de cihekî girîng digire. Li Kurdistanâ Başûr di halê hazir de dravîn çar dewletan tê bîkarânî. Dînarê İraqê, Lîrayê



Mesut Berzanî

kongreyê dîbin. Kongre bi 1200 delegeyên PDK'ê û 250 delegeyên Yekgirtinê tê temsîlkirin.

Kongreya Giştî ya ku 16'ê Tebaxê, roja Duşemê dest pê dike, wê hefteyekê dom bike.

## Serekê Eşîreta Jîrkî Tahir Adiyaman ray birna

**(Dimili)** Navçeya Şîrnexê a Beytûlşebap û devê mabinê Qilîban (Uludere) dê Reisê Eşîreta Jîrkî û Serekê Cerdlevana Tahir Adiyaman rayan birna û navereda erebe xerîban û merdimê xerîbi berê çosme herêmê cinan.

Roja bîn Tahir Adiyaman

ray birna û şoferê name ci Mustafa Adiyaman vinderna. Şofer Mustafa Adiyaman "Bîrâza Tahir Adiyaman, Abdul-lah Adiyaman Taxsiya mi vîndarna û mi tehdît kerdî ti fina berî ma di to bikse." Sevetê i-nan ji tiya heremê ma yo tiya di vukatê bene ti şinê çosme nevazanê."

## HAWAR

### Dilbixwîn

#### "A... Selîm bi vê tasê av vedixwar"

**B**i rastî heyâ ku mirov derbasi nava jiyana gel nebe, nikare hesten wan, eş, ahîn û daxwazên wan nas bike. Ji bo kesê nivískar ev derbâsbûn geleki pêwist e. Gel weke çavkaniyekê ye. Jêderkek dewlemend e. Bi sedan serpêhatiyen dramatik di nava gel de dikarin werin peydekirin. Ji bo ku mirov mijarên objektiv bîne ziman, di serî di divê di nava jiyana gel de were dîtin, hemû çin û kategoriyan nas bike û hesten wan li ser sînga rûpelê vereşine.

Di vê barê de ez dixwazim ji rastiyê bûyerekê bînim bîra xwe. Vê hefteya derbasbûyi hevalê İsmet (Devrim) şehid ketibû. Min ew nedîtitû, lê yên ew dîtine, wiha dibêjin: "Hevalekî devlikin bû, cegerdar, netîrs, welatparêz û fedekar bû. Ji bo gelê xwe amade bû, hemû tişî feda bike. Tu caran ji wezîfeyan nedireviya, ji bo her wezîfeyê hazır bû..." Ji bo bîranîna wî me Komeleya Celleye tespit kir. Ji her derê hatine serxweşiyê. Li aliyeji jin, li aliyê din mîr, gîrî tune bû. Di rojekê de du-sê semîner dihatin pêşkêşkirin. Di wan semîneran de bi sedan amade dibûn. Naverokê semîneran bi giranî li ser şehîdbûn û berxwedana hevalan bû, li ser girêdana serokatiya partiyê bi şehîdan re bû. Li şuna şin û reşigirêdanan civînên fireh, konferans çedibûn.

Vê bûyê berê min da çar salên derbasbûyi: Carekê ez çûme

gundekî Efrînê, navê wê baş nayê bîra min. Efrîn bajareki başûrê rojavayê Kurdistanê ye. Di şoreşê de xwedîye cihekî li pêş e. Gelek şehid dane, gelek ji di nava şerî germ de ne.

Bi giştî şenîyê Efrînê bi tevayî şehid Selîm nas dikan. Wê neyê wi bi dîwarê her malekê ve daleqandiye. Li sînga dîwîr (dîwarî) tu yekser wêneyê şehidê hêjâ û dilovan Selîm dibî-

nî. Tu ji zarokekî ji bipirsi: "Ev kî ye?" Bêyi bifikire wê bersiva te bike: "Heval Selîm e. Şehidê Kurdistanê ye. Çima tu nas naikî!"

Min ji Ehmo (zarokekî 7 salî) pirsî: "Tu çiqasî ji Selîm hez (hej) dîki?" Hinekî ponijî û got: "Ez ji bavo bêhtir jê hez dikim. Her demê ez dixistime hembêza xwe û ji min re çirok digot... Min bêriya wî kiriye."

Piştî ku me hevpeyîn bi hozanvan Hamîd Bedirxan re çekir, em çûne mala welatparêzekî, gelekî ji mala Bedirxan ne dûr bû. Eger cih ne teng bûya, min dê li vir hundîre mala Hamîd Bedirxan bi we bida naskirin. Niha haya min jê tune ye, dibe ku pirtûk bi ser de hatiben hilweşandin û di bin de çûbe.

Li wê malê ji şûretê (wenê, resîm) şehid Selîm daleqandî bû. Piştî gotübêjekî min tilîya xwe ber bi wêneyê wî ve dirêj kir û ji xwediya malê (75-80 salî bû) pirsî: "Yadî! Ez diçime kijan malê wêneyê hevalê Selîm li wir dibînim, gelo çîma?" Hinekî ponijî, serê xwe hilda û bersiva min da: "Selîm...! Pêxemberek bû kurê min. Min hîna insan weke wî nedîtine. Her roj di nava me de bû, ji me re qaseten Serok dihanîn, rojname dixwendin, civîn çedîkirin... Rûnediniş, rojekê li vê malê yekî li wê malê. Rê nedîda ku nexweşî di nava gel de derkevin, her kesî bi xêra wî ji hev hez dikir..." Kesê ew nedîtibe, nikare bi gotinan nas bike.

Çavên Yadî tîjî hêstir bûn. Desmala xwe ji paşila xwe derxist, hêstîrên xwe paqî kirin, li min nihîrî û got: "Rehma Xwedê li canê wî yê şîrîn û nazik be. Çû... Lê hema ez ji wî xeyidîme. Dema ku çû xatirê xwe ji min nexwest. Ez wê hengê di nexweşaneyê de bûm, min dê xelateke xweşik bida wî...."

– Wê te ci xelat bida hevalê Selîm?

Kesereke kûr kişand, kelgîrî bû û gotina xwe temam nekir, di dilê xwe de hişt.

Gel girêdayî şehîden xwe ye, xwedî li xwînê derdikeve û riya wan dişopîne. Min ji metê pirsî: "Madem tu evqasî jê hez dikî, ji bo bîranîne, te tiştekî wî li cem xwe hiştîye?"

Bersiva min da: "Çîma" (Li Efrînê tê wateya "belê"). Ci ye? Min pirsî.

Hêz kir rabû ser piyan, rahêjte gopalê xwe û ber bi sandiqan kincan ve çû. Xuya dikir ew sandiqâ wê ya bûkaniyê bû.

Ji sandiqê tasek derxist. Taseke normal bû, ne weke entîkeyan a veşartinê bû. Ez ecêbmâyî mam. Li şuna xwe rûniş, keliyekê bêdeng ma û got: "A... Selîm bi vê tasê av vedixwar!" Sekinî... Lîvan hev nedîrtin: "Eger ez mirim şûretê wî deynin ser dilê min û wê hengê min di bin axê de veşérin."

# 'Bêdengî sûcekî mezin e'

Gavan Koçer

Pirraniya havîna Norwecê bi baran e. Bayê baranê xemgîniyê dide hawîrdor. Ji xemgîniya hawîrdor malkambaxiyek xwe dilan dipeçîne. Tava rojê kêm xwe dide nîşan. Dema di asoye de tava rojê xwe dide nîşan, xweza dikene, malkambaxiya dilan radibe, rû dikene, meji zînde dibin. Roja Şemiya Tebaxa 93'yan rojekî wilo bû. Ez li cihet bi tenê li ser kevirek rûniştîme, di destê min de rojnameya Klassekampen û rûpelan veldiqutînim. Di rûpela 23'yan de ez rastî portreyek têm. Xuya nabe ku portre di bin bandoriya tava rojê de maye. Li ser rû awirekî xemgînî û bi êş dixuye. Di bin vê rûyê malkambaxî de sernivisek bi tîpêñ mezin hatiye xemilandin.

## BERÊ DINYA XWES XWEZA DİLOVAN BÛ

Dilê min ket reqreqinê. Gelo ev tê çi wateyê? Kê ev gotiye? Çima gotiye? Ne me gelek caran bihistiye ku "bêdengî" ji bo mirov baş e. Min hemâ bi lez û bez dest bi xwendinê kir.

- Şevek kurmek hat ket

xewna min û got: "Niha ez bi xwarina Boşnakîn bêzar bûm (eciz bûm). Niha ez dixwazim derkevîm der, dînyayê û "bêdengîyê" bixwim."

Ev gotinê malkambaxî yên Enes Kisevik bûn. Kisevik, şaireki Boşnakî ye û li Zagrebê dijî. Kisevik, dilê bi keder û keseran ji rojnameya Klassekampen re wilo vekiribû:

- Der barê dînyayê de dîtina min guherî. Berî şer min wer bawer kiribû ku, huner xwedî hêz û quwet bû. Lî, iro ez dibînim, dînya ne di destê huner û rîndiyê de ye, lî di destê hêz û xerabibikaranîna vê hêz de ye. Bi tenê 20-30 mirovên xwedî hêz ew hêz bû û bi milyonan kes û gel bi wî hêzî dihat pelçiqandin. Lî gelek kes heta sîlpaxê (semarê) vê hêzê li ser laşa xwe his nekin, naxwazin xerabiyê bibînin.

- Bêyî me mirovan xweza baştı, av û daristan dilovantir in, dibêje Kisevik. Belê Kisevik! Dema mirovên nexweşê hêzê tune bûn, tanq û top, balefir û bombeyên jehrê nehatibûn çekirin; huner xwedî hêz, dînya rînd, xweza ji dilovantir bû.

Kisevik dibêje: "Mirov dikarin

bikujin, bidizin, birûxînin, lê nikarin rastiyê bişewitînin."

Heger rastîbihata şewitandin dewleta Tirk niha rîza yekemîn girtibû.

Ka em binêrin şairê dilşewitî ji bo rev û terikandina welatê xwe ci dibêje:

"Tu xwedî kîjan navî yî roj?  
Tu bi kîjan galaksê re girêdayî yî?

Kîjan netewe?  
Tu dilsoza kîjan gelî yî?  
Tu nikarî bi tenê bi vî awayî herî der û dorê dînyayê,  
iro li rojhîlat, sibe li rojava

Divê tu bîryara xwe bîdî ku tu kî yî?

Ü tu bi kî re girêdayî yî  
Divê tu xwe şîrove bikî  
Wê ci bibe heger tu bîmirî?  
Emê te li ku bînaştîn?  
Li kîjan welatî?  
Li kîjan hêla aşîmanî?  
Li kîjan herêmî?"

Em dikarin ji gotinê rast re ci bîbêjin. Kisevik, pênuşa xwe ji bo welat û hemwelatiyên xwe tûj kiriye, lê di dîmansiyoneke navneteweyî de ye. Her bindest dikare xwe tê de bîbîne. Em ji zêde meseleyê dirêj nekin û li vir biqedînin.

## JI ÇAPEMENIYA BIYANI KLASSEKAMPEN

### Turkiye tê boykotkirinê

**Norwec, Welat-** AKP, Partiya Komunîst a Norwec, dixwaze di warê tûrîzmê de Turkiye boykot bike. Vê yekê ji rojnameya Klassekampen re Arnolt Ask (Nûnerê AKP'ê yê navneteweyî) dibêje:

"Hikûmeta Turkiye ji bazirganiya tûrîzmê hem valuta (pere) û hem ji fermîtiyê digire. Ji bo ku ev hikûmet bikaribe hêzê di destê xwe de bîhêline û aparata xwe ya hêzê ji nû ve bi hêzîr bike, qezenza aborî girîng e. Wekî din ji bi vê mirov destek dide rejîmek (Tirk) ku tehlî û êşê dide bi hezaran mirovan. Ji hêla din ve ji rejîm bi nîşandana cihen tûrîstîk ve qezenceke ideolojîk ji dî destê xwe. Bi vê yekê tûrîst dikarin zû bêñ xapandin û der barê Turkiye de bibin xwedî ifadekî rind û bîbêjin li Turkiye aşîî heye, Turkiye li dijî Kurdan û opozisyonê din têkoşîneke bi êş nade meşandin. Lewma em dixwazin piştgirîya xwe bidin boykotkirin."

Li ser bombekirinan ji Ask, "Em metodênu ku digêhin aliyê sisêyan, nafejîrinin, Lî, em metodênu ku li dijî cih û avahiyê aborî ku qezencê didin dewletê, têñ bikaranîn dipejîrinin."

Ji hêla din ve ji Berpirsiyarê Derveyî yê Partiya Sosyalist (SV) Paul Chaffey, boykotkirina tûrîzmê rast nedît û dîtinê xwe wiha parastin:

"Bi qeydîye ku Turkiye muamele bi Kurdan dike, wê rexnekirin kiriye heq. Divê mirov Turkiye rexne bike, bîpestîne ku dê ew politikaya xwe biguherîne. Lî, divê mirov rî ji li têkiliyên nav mirovan negire. Têkiliyên nav mirovan girîng in."

Wekî ku tê zanîn ev demeke dirêj e Partiya Karkerê Kurdistanê (PKK), ji welatên Ewrûpa xwestibû ku ew li dijî qirkirînê dewleta Tirk derkevin û tûrîzma Turkiye boykot bîsin."

## Le Monde

### Mogadisio li benda êrişen hêzên RNY'ê ye



Leşkerên RNY'ê nefretâ Somaliyan dikişînî ser xwe. Di wêne de xortekî ji Somali, kîna dilî xwe ya li hember leşkerên Amerîkî, bi fişekberdâna ser bermayıyîn leşkerekî Amerîkî diyar dike.

Niştecihîn Mogadisyo, pişti ku 8'ê Tebaxê çar leşkerên Amerîkî yê li basûrê Mogadisyo hatin kuştin, kete nav xof û bêdengîyê ku hêzên Neteweyîn Yekbûyi li heyfa wan bigere. Ji van çar leşkerên Amerîkî sê heb jê di cih de mirin, yek ji, ji ber birînê xwe yên xedîr dû re miye.

Ji dema ku Rêxistîna Neteweyîn Yekbûyi (RNY) berpirsiyariya operasyonê li Somali girtiye ser xwe û vir ve, ev cara yekemîn e ku leşkerên Amerîkî têne kuştin. Bi van çar kuştîyên dawî re hejmara kuştîyên ji hêza RNY gîhîst cil û yekî. (27 Pakîstanî, 7 Fasî, 4 Amerîkî, 3 İtalyan)

Ji 5'ê Hezîranê heta vê gavê di şerî navbera milisîn General Muhammed Farah Aïdid û leşkerên RNY'ê de 165 "kumik şîn" birîndar bûne.

Büyera roja yeksemê, li paytexta Somali, bû sebebê zêdebûna tansiyonê. Nûnerê RNY'ê yê Somali, Amîralê berê Jonathan Howe ji kuştina çar leşkerên Amerîkî Mohamed Farah Aïdid berpirsiyari girt û li ser vê bûyerê wiha axivî: "Emê li dijî terorîzma Aïdid ne musamaha kar bin. Emê li hember terorîzma wî xwe biparîzîn û bîkevin pey berpirsiyari van cinayetan."

Serokê Amerîka Bill Clinton ji li Washingtonê, di daxuyaniyeke der barê bûyerên Somali de dîtinê xwe wiha anîn ziman: "Ji bo girtina berpirsiyaren bûyeran û ji bo parastina hêzên me yên li Somali, ci ji me bê emê bikin. Emê di nav RNY'ê de hereket bikin."

Li aliye din 250 leşkerên din ên Fransiz ji bo ku herin Somali roja Şemîyê ketin rê. Ewê li bajarê Bayoa, rojavayê Somali, bêñ bicikirin. Fransayê, 14'ê Tirmehê ji 1982 leşker şandibû Somaliyê li gor agahiyen RNY'ê.

## Li Azerbeycanê referandûm

**Navenda Nûçeyan-** Rêveberiya Azerbeycanê ya nû di 29'ê Tebaxê de wê referandûmekê çêbîke. Ev referandûmu ku wê bi mebesta tesbîtkirina dîtina gel a der heqê Elçibey de bê çekîrin, ji aliye Cepha Gel ku aligirê Ebulfeyz Elçibey e, ve tê protestkirin.

Di referandûmu 29'ê Tebaxê de wê ji xelkê bê pirsîn ka baweriya wan bi Elçibey heye an na. Cepha Gel vê referandûmê wek faaliyetekî dij-qanûn dinirxîne û ji bo protestokirina wê bangî gel

û terefdarên Elçibey kir, ji vê gav ve Cepha Gel bi mebesta li darxistina mîtingê xurt li dijî referandûmê ketiye nav hewldana amadekariyê.

Rayedarên Cepha Gel dan diyarkirin ku, hedefa vê mîtingê protestokirina girtinan, balkışdina ser dij-qanûniya referandûmê û xwestina îadekirina râyeyen Elçibey yên di 24'ê Hezîranê de jê hatibûn standin.

Weke tê zanîn di 24'ê Hezîranê de pişti ku Suret Huseynov di dawîya şerhildaneke mezin de

hatibû ser kar, Serokkomarê berê Ebulfeyz Elçibey ji Baku reviyabû, lê pişti ku reviyabû ji hemû rayeyen xwe bûbû.

Li aliye din, greva birçibûnê ya ku terefdarên Cepha Gel û Partiya Musavat ketibûnê, hîna didome. Gelek endamên Cepha Gel û pêşewayê (lîderê) Partiya Musavat Isa Kamberov ji hêla rîveberiya nû ve hatibûn girtin.

Ji xeyni Cepha Gel û Partiya Musavat, deh partiyen din ên müxalefetê ji destekê didin mîtinga li dijî referandûm û girtinan.

# Ji fasîstan artêsa taybetî

**Navenda Nûçeyan-** Komara Tirk, li hember têkoşîna rizgariya gelê Kurd û rêberê wê, di amade-kariya sazkirina artêseke taybetî de ye. Amadekirina vê artêse, bi pêşniyara partiya fasîstên Tirk MHP'ê û bi desteka serleskeriya Tirk pêk tê. Hikûmeta koalisyonê ji bo imhakirina şerê rizgariyê, ji bili çareseriye demokratik hemû riyên li dijî mirovahiyê daye ber xwe.

Li gorî ku diyar bûye, dê ev artêş ji njadperest û fasîstên Tirk bê avakirin. Ji niha ve ji MHP'ê, bi sedan kes di rêzê de ne. Îdeolojiya vê artêse ji, ji aliye vê partiya fasîst ve hatiya amadekirin. Li gorî vê îdeolojiya kevnare, "Kurd tune ne, ew ên ku ji xwe re dibêjin Kurd jî, di rastiyê de Tirk in û hatine xapandin. Şerê bi PKK'ê re, li gor qaydeyên hiqûqê û demokrasiyê nameşê. Ew ji hin dewletan alîkarî stînin. Ger pêwist be, divê Tirkîye bi Sûriyê re bikeve şer...û hwd"

Cigîrê Serokê Giştî yê MHP'ê Riza Müftüoğlu, di hevpeyvîna xwe ya bi kovara EP'ê (Ekonomi-politik) de, li ramana 'artêsa taybetî' xwedî derdikeve û li ser pîrsa nûçevanê EP'ê wiha dibêje: "Di şerê çekdarî ya ku dewlet di-meşine de gelek kêmâsi hene. Li wê herêmê, leşkerên bêtetrûbe, li hember kesen ku 6 mehan per-werderiya gerila dîtine şer dikin, ji ber vê yekê ji biser naaktiv. Lewre li hember wan artêsek bi pergal nîn e. Heta iro gerila li hember artêsa bi pergal bi ser ketine. Ji ber vê ji, divê şerê çekdarî bi mirovîn perwerdekirî bê meşandin. Weki din şerekî îdeolojîk ji pêwist e. Hemwelatiyên me yêndi Kurd ên ku besdarî



PKK'ê bûne, wilo bawer dikin ku ji mîletekî din in û dixwazin dewletekê damezîrinin. Ger şâşıya vê ramanê neyê pejirandin, koka wan nayê birrin".

Riza Müftüoğlu li hember tekoşînen azadîxwaz, ji şerê dewletîn din ji mînakand dide û dixwaze ku têkoşerên Kurd bêdaraz bêne idamkirin. Weki din pêşniyarek tîne ku KT li hember Sûriyê ilan bike û Bekaa bê bombe-kirin. Li ser pîrsa nûçevanê EP'ê, Müftüoğlu ji bo têkîbirîna şerê neteweyî ya Kurd salek bi tenê dixwaze: "Bila li hêviya me bihelin, em dê di salêkê de qîra wan bînîn. Divê yêndi ku, dê di nava vê artêsa taybetî de cih bigirin, bi taybetî bêne perwerdekirin. Divê ev perwerdekirîn bi awayî gerîla be. Em dê bi vî awayî, di salêkê de PKK'ê tune bikin. Gelek

xortêne me hene ku dixwazin di vê artêse de cih bigirin. Lê divê bêne perwerdekirin".

Amadekariyên avakirina artêsek taybetî di nava parti, roj-name, nivîskar û rayedarêne dewletê de ji bû sebebê guftûgoyan. Hin kes ev artêş şibandin 'Çerîyen Osmanî' û 'Lejyonên Fransız'. Ji hin sazî û partîyen kevne-perest pê ve, gelek ji wan ne bawer in ku, dê ev artêş ji pîrsigirêkê re çareseriye bîne. Lê raste rast ji li hember dernakevin. Tirsa wan a mezin ew e ku, dê rojek ev artêş bibe bela serê KT'ê û dê kontrolkirina wê gelek bi asteng be.

Wisa diyar e ku, Tirkîye li Kurdistanê bîyara qetlîamên girseyî daye. Ji bo vê kîryara pîs ji, xwe dispîre fasîstan û dixwaze vî karê pîs bi wan bide kirin.

## Türk-Îş'ê karker firotin

**Navenda Nûçeyan-** Pişti gelek gengeşî, lihevruñiştin û gîli û gazinan, hikûmet û Türk-Îş li hev hatin. Lihevhatin di saet 21.30'ê şeva 11'ê Tebaxê de li avahiya Serokwezîrtiyê ya kevin çebû.

Hikûmet û Türk-Îş li ser van xalan li hev hatin: Ji bo 6 mehan pêşin %37 û ji bo 6 mehan dawîn ji %28 bêhtirkirina mehmîniyan karkeran, tezmînata der-xistina karkeran a ji kar ji, kîrin bergidînî (berdîl) 7 mehan.

Türk-Îş ji bo 6 mehan pêşin %40 û ji bo 6 mehan dawîn ji %35 xwestibû.

Lihevruñiştin navbera hikûmet û Türk-Îş'ê, di 10'ê Tîrmehê de dest pê kiribû û Türk-Îş di ci-vîna xwe ya 10.8.1993'yan de bîyara grevê ji bo 25'ê mehê standibû.

Serokwezîra Tirk Tansu Çiller ji di 10'ê Tebaxâ 1993'yan de bi bernameya televizyonê ya bi navê "Bangkirina li Neteweyê"

xeyba karkeran. ji gel re kiribû û piştgirîyê ji wan xwestibû.

Çiller di bernameyê de li ser tengasî û gelemşeyen Tirkîye rawestiyabû û bêderfetiyen hikûmetê anîbû ziman.

Heta Çiller ji gel re diyar kir ku, hemû derfetên xwe ji bo temartina Şerê rizgari yê gelê Kurd seferber kirine û di xezîneya dewletê de pere nemane ku mîziya karkeran zêde bike.

Pişti vê lihevhatinê, hikûmeta koalisyonê sîngâ xwe ji destê 600 hezar karkerî filitand. Ger ku li hev nehatana, dê 600 hezar karker di 25'ê Tebaxê de dest bi grevê bikiranâ.

Di daxuyaniyên rayedarê hikûmet û Türk-Îş'ê de diyar dibe ku ji bo "gelemşeyen giřing" û Tirkîye li ser mercen jorîn li hev kirine. Wezirê Dewletê Bekir Samî Daçe kîfxweşîya xwe bi van gotinan bi lêv kir: "Em tava bîharê ya pişî baranê dijîn." Serokê Türk-Îş'ê Bayram Meral ji, "Her çiqas ji aliye aborî ve tişte me xwestibe bi destê me neketibe ji, ji bo huzûra gel û welat encamekî giřing e" got.



Serokê Türk-Îş'ê Bayram Meral û Serokwezîra Tirkîye Tansu Çiller

MHP'vanen  
ku têne  
bijartin û  
wek tîmîn  
taybetî  
dişînin  
Kurdistanê  
li wir  
qetlîam û  
cînayetan  
pêk tînîn.  
Pirraniya  
wan ji  
kesen li  
derveyî  
civatê mayî  
têne bijartin

## Li DGM'ê idama Teslîm Töre hate xwestin

**Navenda Nûçeyan-** Di 10'ê Tebaxâ 1993'yan de, ji bo Serokê Partiya Keda Komünîst a Tirkîye (TKEP) Teslîm Töre û 5 hevalên wî yên din li Dodgeha Ewlekarîya Dewletê (DGM) ya Stenbolê e, bi xwestina idamê dawê vebû.

Teslîm Töre û 5 hevalên xwe (Hüseyîn Bakir, Mehmet Ali Ayhan, Murat Toprak, Ergun Adaklı û Kenan Kalon) 22 sal bi firarî jiyanâ xwe dom dikirin û li wan dihate gerîn.

Teslîm Töre û 7 hevalên xwe di 5'ê Gulana 1993'yan de, li Üsküdarê, li Taxa Örnek'ê di malekê de hatibûn girtin.

Li gor idfanameya ku Dozgerê Dodgeha Ewlekarîya Dewletê ya Stenbolê amade kiriye bi van dîtin û tevgeren tê darizandin: "Xwestina guhertina Qanûnê Bingehîn û teşebûskirina rîlibergirîn wezîfeyen meclîsê yê bi darê zorê."

Li gor xala 146. TCK'ê (Qanûnê Cezayî yêndi Tirk) idama wan hate xwestin. Di idfanameyê de, di heqê Teslîm Töre û Abuzer Uğurlu de, her wiha sîcdariya ticaretâ narkozê û temînkirina çekan ji bo Kurdîn li Îran û Iraqê û casûsî ji bo Bûlxarîstanê cih dire. Mirovîn ku bi Teslîm Töre re hatibûn girtin, ji bo wan ji cezayê hepsî têne xwestin. Ji ber ku ew ji, ji bo rîexistinê pere û çekan temîn kîrin.

## Hikûmet ji êdî nikare kirinê xwe veşêre

**Navenda Nûçeyan-** Saziyên dewleta Tirk ji êdî nikarin rengê şerê qirêjî yê li Kurdistanê veşîrin. Kirinê hêzîn dewletê û yên cerdevanî êdî bi tu awayî nayê nixumandin.

Rapora Komîsyona Lîgerîna Cînayetîn "Kiryar Nedîyar" a Meclîsa Tirk, vê rastiyê wek tava rojê datine ber çavan Komîsyon der barê cînayê "kiryar nedîyar" de li Amedê, Batmanê û li Farqînê lîgerînekê pêk anîbûn. Ev lîgerîna xwe wek raporekê amade kîrin.

Komîsyon di raporê de gelek tişîn balkêş tîne ziman. Rakirîna pergala cerdevanîyê û rîveberiya taybetî dixwaze, rexne li rîveberîn Tirk digire û azineyîn dewletê şas û çewt dinirxîne. Her wiha 'Rîveberiya Taybetî' wek çespîneke bêkér ji aliye komîyonê ve tê nirxandin.

Dîsa di raporê de didin nîşan ku, cerdevan bi xwe cerdi ser gundan dikin, gundan û gundiyan dicesirîn, wan dikujin û piş re bûyerê dikin stûye PKK'ê. Ji bo vê rewse ji gundê Çîcîka ya Farqînê mînak nîşan didin; ku ji hêla cerdevanîn Boşatê ya Farqînê ve cerdek lê hatibûn kîrin, malîn gund hatibûn şewitandin û du gundî ji hatibûn kuştin.


Li ser tevgeren cerdevanîn ên bêqanûnî ji radiwestin û dixuyînîn ku cerdevan bi xwe karêne li rî, qaçaxiya sîleh dikin û hwd.

Komîsyon di rapora xwe de li ser itirafkaran ji disekine; Li gor raporê itirafkar li Amedê (Diyarbekir) li Lojmanê Polîsan dimînin, di şûna ku dewlet ji wan kîr û feyde bibîne ew ji dewletê kîr dibînin, dewletê dixapînin, besdarî bûyeren şîlinê û dişiyê dibin. Rapor kirinê itirafkar û cerdevanî ji wiha şîrove dike: "Hem çalakiyê ne li rî ku cerdevan besdar bûne û hem ji ku itirafkar besdar bûne, bûne sebebê dilsariya gel a ji dewletê, bawerî û ewlebûna gel ji dewletê şikiyaye û bi şik û guman li dewletê dinîrin."

Li ser sistema idarekirina bi wekaleti ji komîsyon radiweste, rexne li vê pergalê digire û sebebê bi pêşveçûna tevgera PKK'ê bi sistema revêbirîna bi wekaleti ve girê dide.

Rapora Komîsyona Lîgerîna Cînayetîn "Kiryar Nedîyar" a Meclîsa Tirk, li ser rewşa dewleta Tirk û PKK'ê ya li Kurdistanê ji radiweste. Dide nîşan ku tu fonksiyona dewletê li Kurdistanê nemaye, dewlet nikare pereyên av û elektrîkê ji, ji gel bistîne. Lî PKK ji gel "bac" û pêk distîne.

Komîsyon ji van mebûsan pêk hatiye: Serokê Komîsyonê M. Sadîk Avundukluoglu (DYP- Mebûsê Kirikkale), Mustafa Yilmaz (SHP- Mebûsê Meletê), Atîla Hun (CHP- Mebûsê Qersê), Husamettin Korkutata (RP- Mebûsê Çepekkurê (Bingol)).



Teslîm Töre

*Bi berpirsiyarêne odaya pazarvanan re hevpeyvîn:*

# ‘Dewlet ji pazarvanan ditirse’

Hûn karin xwe bidin naskirin?

– Navê min Ceylan Aktaş e. Ez li Stenbolê hatime dinyayê, malbata me ji Qefqasê hatiye. Ez 6 sal di sendikaya DİSK'ê de nûner bûm, pişti cûnta leşkeri ya 12'ê Îlonê em bêkar man. Min dest bi pazarvaniyê kir... Ev 9 sal e ji pazarvaniyê ta serokatiya odaye min kiriye; niha ji didomînim.

Berê hûn komele bûn, niha ji bûne ode (menzel). Di navbera ode ú komeleyê de ci cihetî heye?

– Di meclisa Tirkî de hin qanûn guherandin, ji ber ku tevlihevi çedibû. Wek komeleyên çandî, komeleyên hewwanan û hwd. ku girêdayî qeymeqaman e, navê wan ji komele bû. Ên mîna, pazarvan, şofîran û hwd. yanî yêni pîseyî (meslekî) ji komele bûn û gelek tevlihevi çedibûn.

Ji ber vê yekê yêni pîseyî gişt bûn ode ú girêdayî Odeya Sanayiyê bûn. Li gorî vî qanûnî nû derketiye gava der heqê pazarvanan de biryar bê standin pêwist e nûnerekî me ji amade be û bi hev re biryar bîdin.

Heta niha çend endamên girêdayî oda we çebûne, ji bo endamîyê mercen (şert) we ci ne?

– Vê gavê 20 hezar endamên me hene, ji bo endamîyê ji tenê pazarvanî bes e. Jixwe yêni ku pazarvan be pêwist e bibe endamê oda me. Salê ji 250 hezar em ji endamen xwe berdelê endamîyê disînin.

Hûn wek odaya pazarvanan ci karî dîkin?

– Karê me girêdayî pazarvanan e. Problemeke pazarvanan li ku derê hebe em li wir in. Pazarvan berî sibehê diçin ta nîvê şevê dixebeitin; bi problemen xwe re nikarin eleqedar bibin, vî karî ji em dimesînîn.

Wek tê xuyakirin pazarvan gişt Kurd in, sedemê wê ci ye?

– Pazarvan tenê ne Kurd in, di nav pazarvanan de Laz, Çerkez, Ereb, Tirk 'her cure însan hene û dixebeitin. Lî zafî wan Kurd in. Ji ber ku dewleta Tirk, gundan xera dike gunđi ji mecbûrî koçê dibin. Ên ku lêzimê wî pazarvan be, tênbâlê, xwe lê digirin. Ew ji pêşî li ber dezgeha limonan difiroşe, paşê ku der û dora xwe nas dike ji xwe re cih distîne. Bi vî awayî dibe pazarvan.



Serokê Odeya Pazarvanan ê Stenbolê Ceylan Aktaş (Ê rûnişti) bi endamên odaye re.

Gelê Kurd weke gelên din ne xwenda ye ku karekî din bike. An wê li înşeatan bixebite an wê pazarvaniyê bike, an wê tiştîn seyar li ser erebakan bifiroşe. Li metropolan halê gelê Kurd ev e...

Ci astengî an problem li ber xebatên we hene?

– Giş problemen me bi belidiyeyan re ne. Wek ku bi dilê xwe cihê pazarên me di guherîn; dibin sebebê nanê gelek hevalên me yêni pazarvan. Mînakek em bidin, wek Şîşli. Serokê Belediyeya Şîşli Fatma Gîrîk, cihê pazareke me rakir me ji itiraz kir. Çapemeniya Tirk me wek “teror” sûcîdar nîşan da û got: “Odeya pazarvanan, pazarvanan provoke dike.” Û çapemenî geleki li ser sekînî ta ku cihê paza-ra me rakirin. Fatma Gîrîk soz û bext da ku, wê cihekî din ji bo pazarvanan veke û sozê xwe ji anî cih. Lî çawa di cihê pazarva Kevin de ku rojê te 100 hezar kar dikir, li cihê nû 10 hezar dimîne. Ji ber ku zaf ji gel dûr e. Berê li Edenê û Amedê ji polîfikayêni wiha kiri-bûn, niha ji dixwazin li Stenbolê wiha bikin.

Pazarvan diçin cihê pazarvan gişt Kurd in, sedemê wê ci ye?

– Dewlet ji pazarvanan di-  
tirse. Bi giştî ji yêni ku ji Kur-  
distanê hê nû tênen. Dewlet  
dibêje li Kurdistanê gel ne di

dilê me ye, ji ber ku em bihêlin hevalê me herin wir si-  
behê wê pazareke din ji bigi-  
rin. Gere em rê nedîn beledi-  
yan û li ber xwe bidin.

Problemên pazarvanan ci  
hene, bi kurtî hûn karin  
bibêjin?

(Bersiv: Sekreterê Giştî yê  
Odeya Pazarvanan M. Şerîf

Giş problemen me,  
bi belidiyeyan re ne.

Wek ku bi dilê xwe  
cihê pazarên me  
di guherîn; dibin  
sebebê nanê gelek  
hevalên me yêni  
pazarvan. Mînakek  
em bidin, wek Şîşli.

Serokê Belediyeya  
Şîşli Fatma Gîrîk, cihê  
pazareke me rakir me  
ji itiraz kir. Çapemeni-  
ya Tirk me wek  
“teror” sûcîdar nîşan  
da û got: “Odeya  
pazarvanan, pazarvanan  
provoke dike.”

Bayram)

– Dewlet ji pazarvanan di-  
tirse. Bi giştî ji yêni ku ji Kur-  
distanê hê nû tênen. Dewlet  
dibêje li Kurdistanê gel ne di

destê me de ye, em li metro-  
polan ji fersend bidin wan wê  
alîkariya “terorîstan” bikin.  
Wê herin ba wan, ji ber vê ji  
nahêlin ku pazarvan wek  
xwesteka xwe bin...

Komele an ji odaya pazar-  
vanan ji kîjan hengê ve heye?

– Komeleya pazarvanan di  
sala 1964'an ve heye û heta  
niha ji didome. Wekî din, di  
eynî tarîxê de ji bo pazarvanan  
bi navê “Komeleya Maf-  
parastinê ya Pazarvanan” ve-  
bûye. Lî niha tu mafê pazarvanan  
naparêze. Ji ber ku yê  
ku nikaribe xwe biparêze,  
mafê pazarvanan qet nikare  
biparêze.

Ez dixwazim der heqê  
serê Kurdistanê de ji we bi-  
pîsim, wê ser çawa biseki-  
ne?

– İro li hember gelê Kurd  
şerekî qirêji terefi dewleta  
Tirk ve tê meşandin. Bi dehan  
gund tênen bombebarankirin,  
koçberkirin, dîsa li serê ciya  
sedan xort tênen qetilkirin, le-  
ker tênen kuştin. Ma ev lawê kê  
ne, lawê Demîrel an yê Gûres  
in? Ku bîbêjîn edî ser bes e bi-  
la kes neyê kuştin, gund  
neyen talankirin û koçkirin.

Weke têzanîn PKK serrawes-  
tinê xwest û nêzî du mehan ji  
yekalî rawestand, lê dewleta

Tirk kuştin û cînayetên xwe ji  
gelê Kurd kêm nekirin. İro ji  
çek pê ve tu rê li ber gelê  
Kurd nemaye, dewleta Tirk  
mecbûr kiriye.

Ji bo pêşveçûna zimanê  
Kurdi pêwist e ci bê kiri?

– Zimanê Kurdî wê bi saya  
kovar, pirtûk, rojname, sazge-  
hêñ wek NCM (MKM), Enstî-  
tuya Kurdî ev bar li ser milê  
wan e, ziman divê bê safikirin  
ferheng derê, dawî ji dibis-  
tan. Bi dîtina min wê ziman  
wiha bi pêş ve here. Lî ez  
dixwazim rexneyekî ji li van  
sazgehêñ Kurdî bikim. Ku teş-  
fiq nakin gelek xorten Kurd  
hê ji nizanîn ku bi zimanê  
Kurdî nivîs tê nivî sandin.  
Pêwist e ku teşfiq bikin xwen-  
devanan...

Dixwazim tiştekî din ji  
bîbêjîm ku hin sazgehêñ Kurdî  
tiştîn nebûyî li mirov dîkin.  
Mînakek ku em bidin: wexta  
ku hilbijartina me çebû hin  
rojnameyan nivîsand ku hilbi-  
jartina me bi hîle û fetl û fatan  
çebûye, mixabin. ew ne rast  
bû. Ü em nizanîn ji bo ci ev  
hatibû nivî sandin.

Tiştekî me nepirsî û hûn  
bixwazin bîbêjin heye?

– Na. Spas.

**Hevpeyvîn:  
Salih Günbat**



Negirî, nekene, lê fêm bike.

Spinoza

# Rûçikê bi mast spîkirî

Yekî bajarî, heşt bizinê wî hebûn. Serê zivistanê her heşt bizinê xwe dide dos-teki xwe yî gundi bi sexil (hilberiya ku ji wan re bê, wek kar, mû û rûn, dê li hev û du par bikin). È gundi xasûk e, destê wî ji bizinan nabe, çavê wî li fen û hîleyan e. Got: "Şirîko, bêhna xwe fireh bi-

Ma iro ez hatim bîra te. De rabe biçe bizinê min werîne ku em ji hevdu xelas bibin. Tişte te bi serê min kir, ta niha kesî bi serê min nekiribû."


È gundi xasûk e, destê wî ji bizinan nabe, çavê wî li fen û hîleyan e. Got: "Şirîko, bêhna xwe fireh bi-

ranek hat, xak bûbû çirav, yek teqînî, yek peqînî û yek jî hat li cem wan sekinî. Min ew anîn malê, êvarê yek nivistî, yek ling şikestî û yek jî li cem wan rawestî, ev bûn şes. Ya çal, rojekê ma li mal. Ev bûn heft. Ma yet. Ew jî za, karek anî. Iro min ew anî bajêr, firot da bi kerek kalani. Va ye kîr bi min re ye. Emê li hevdu par bikin.

Te divê kalan ji te re û kîr ji min re û te divê, kîr ji min re û kalan ji te re." Bi herdu awayî jî kîr par xwe dixist û didomîne. "Va ye min sîtilek mast jî, ji te re anîye." Xwediyê bizinan, ji behecan re, radibe sîtila mast, bi serê yê gundi de dike. Rûyê (rûçikê) yê gundi tev dike

mast û spî dike. È gundi dibêje: "Şirîko, ez geleki kîfxwes bûm, va ye rûyê min li ber te spî ye. Elhem-dullah, îsal jî ez û tu bi rûkî spî ji hevdu xelas bûn."

I. Omerî



ke, li min jî bihishise. Tişte ku bi serê min hatiye bila bi serê gawirê sefqa kirî neyê.

De rabe pênûsek û kaxezekê werîne ku em hesabê xwe bikin. Zivistan bû. Min bizin birin çolê, çeriya. Ba-

Jûjî...

Doğan Güzel

\* FESTİWALA "AŞTÎ Ü ÇANDÎ" KU WÖ DI 3-8'E  
TEBAXE NE ŞEBİBÜYA JI REK 15'E TEBAXE  
BI PAŞ VG HİTTE XİSTIN



# TÎR

Musa Anter



## Musa Anter û fitîl

K edxwarî, ji bilî inkar, xwînmijî û talankeriye; bêbexfi, bêtifaqî, dubendî, fesadî, birakuji, casusî, derew, xapandin, zîna, dizî û birçitî ye. Kurtî ji bo gelê bindest xelat û diyariyêne wê ev in... Kirin û firotina wê xeletî û çewti ne. Ji ber wan xasiyeten hov roj bi roj di nav gelê bindest de tovê xayîn û xiyanetê dicîne, ji bo xwe hevalbend, xwefiroş û kirêgirtiyan zêde dike. Piştî dagirkêri peyde bû, xweşî cihe xwe dihêle ji bo nexweşiyê; şûna ronahiyê, tarî dibe mîvan, ken mala xwe bar dike ji ber giriye.

Ji ber wê yekê ye ku, dema Misir di bin destê Îngîlîzan de ye şairek rewşa gelê bin bar bi van rîzan tîne ber çav: "Erê ez nizanim ev şemal ji bo ci digirî? Sedemê giriya wê gelek nêzîkbûna agirî, an jî dûrketina hingivînî ye? Nexêr sedem ew herdu jî nîn in. Tiştekî ne ji wê, biyanî di nava wê de heye (fitîl) ew e wê giri berde."

Belê, her neteweyekî kîmasiyêne wê hene. Lê belê her weki helbestvan ji gotiye dohnê (rûn) şemalê gelê bindest, fitîl ji gelê serdest e. An ku kedxwar û dagirkêr in. Fitîl rûndikêne çavên şemalê dibarîne, her dem giri ber de û diheline.

Gelê Kurd di dîrokê de çend taybetiyênen xerab ji Ereb, Fars û Tirkan wergirtine. Neyartiya di nav Kurdan fêkiya wan e. Alayên Hemîdiyê, cehşîti, cerdevanî, hîzb-i kontra hemû berhemên wan in. Gelek caran tetîka xiyanê hin Kurd dikişînin. Lê li piştâ wan dijminê biyanî heye.

pal di destê neyar de ye. Kurdên hevalê dijmin hemû deman hevsarkirî ne. Kurdê lixavê (gemî) wî di destê dijmin de ne be, nikare li hemberî têkoşîna gelê xwe bisekine.

Dera ku hirç bi xwe lê giyar hewce nîn e pêşûna (şopa) wê bigerin. Ev ro dijmin hemû hêzên xwe ve êrişâ tîne ser gelê Kurd. Di paş vî şerî qirêgirtî de tiliya wî heye. Qatîlê mezin ew e. Ên din hemû feqiyen wî ne. Dubendî û dijminahiya nav gelên bindest madeyeke ji zagona kedxwariyê ye. Ger wê çeka jengargirtî tije neke, ji xwe mîtingehiyê nadomîne. A gîring ew e ku, her welatparêzekî Kurd biyanîtiya di nava şemalê de nas bike û dema hirçê ber çavên xwe dibîne li şopa wê nege-re.

Dagirkê dijminê rewşenbiran e. Ew baş dizane ku ew in ên zeviyêne beyar avî dikin, ew in şivan û rîber, ew in ronahiyâ navneteweyan. Dagirkêrên Ereb, Fars û Tirk bi hezaran çira û findên Kurdan vemirandin. Ên kuştinê kuştin, hin ji wan di zindanan de rizandin, gelek jî derbeder kirin û di welatên xerîbiyê de mirin bêxwîn, bêbirin.

Musa Anter yek ji wê refê bû gîhiştî destê me. Ber dilê me ew xelatê Kurdên Gotî û Kasît, diyariya Medya û Kerdoxiyan bû. Zanatiya rengê Zerdeş, mîranî û di baweriya xwe de ji nêzîkê Şêx Seîd, Qadî Muhamed, Seyîd Rîza bû.

### CİNARA KEVNAR

Çavêne te	Belav bûne serxetê
Nemînin paş ve	Mezrabotan
Ey	Zozanên billind
Çinara	Deş û beriyêne
Şînbûyi şikevtên Zivingê	Bêdar û ber.
Çiq belav û kevnar	Tu namirî
Tu	Bi
Ne bêkes i	Guleyên celadên kirêgirtî
Ne bêxwedan i	Hîzb-i kontra yên
Ne jî	Hevsarkirî
Bêxak û bêwar i.	Ên Dijminê har lê siwar.
Rehêne te	<i>Behzad Berçelanî</i>

# Germa hilpişkîna 15'ê Tebaxê

● Hejmara êrîş û livbaziyên gerîla divê mehê de bêqedar in. Ji destpêka meha Tebaxê ve, bandora (tesîra) 15'ê Tebaxê, roja hilpişkîna serê çekdarî, bi êrîşen gerîla yê ser qereqol û tabûran xwe nişan da. Tenê di nav 15 rojan de gerîlayê ARGK'ê ji dehan zêdetir qereqolên dewletê rûxandin, bi sedan leşker, serlesker û cerdevan kuştin û zerarên mezin ên daringî dan dewleta Tirk. Êrîşen gerîlayê, serfiraziyên tevgera neteweyî, hêviya gel bi şoreşê zêdetir dike.

**Navenda Nûçeyan-** Di hefteya dawî de şerê çekdarî yê Partiya Karkerê Kurdistanê ji hemû deman xurttir bû. Li gor xurtbûn û zêdebûna livbaziyên hêzên ARGK'ê, hêzên dewletê ji bi mebesta rîelibergirtina bilindbûna têkoşîna neteweyî, bi hemû derfetên xwe yê hovane girtin ser kesen destvala, gund şewitandin û zilm û pesta xwe bêrawestin domandin.

Hêzên ARGK'ê, ji Serhedê bigirin ta Deşta Ruhayê di hefteya çûyi de derbeyên pirr mezin li dewletê dan. Hejmara livbazî û çalakiyên gerîla ewcend zehf in ku, derfet nîn e mirov ji hemûyan haydar bibe.

Lê teví vê yekê çapemeniya Tirk a ku li gor direktifên leşkerî hereket dikin, çawa ku tiştek tûnebe, nûçeyen cenga ku li Kurdistanê didome, naweşinîn an ji bi awayekî bêrevajî diweşînîn. Lê her çiqas ew xwe kerr ji bikin, şerê têkoşîna Kurd a neteweyî bêrawestin didome û pêlên xwe diavêjê hemû deveran. Tenê di hefteyekî de bûyerên ku li Kurdistanê qewimîn ên ku hatine tesbitkirin ev in:

**6 Tebax 1993:** Li Erzêromê dibistanen 5 gundên bi navê "Kahlîk, Şabedîn, Arûz, Armasî û Demîrcî" ji aliye gerîla ve hatin şewitandin. Pişti êrîşa gerîla hêzên dewletê, girtin ser van gunan û 40 kesan xistin bin çav.

Li Serhedê bi geşbûna şer re cerdevanen Azerî ji dev ji vî karî berdan. Li İdirê gundê "Uğurca" ku li ser navçeya Qulpê (Tuzluca)ye 11 cerdevanen Azerî silêhîn xwe teslimî qereqole kirin.

Gerîla pêsi li ber 4 erekbeyên leşkerî ku malzeme ji bo avakirina qereqolan ji Sertê dibirin navçeya Banê (Güclükonak) ya Şîrnexê girtin, 4 şofêr kuştin û malzeme şewitandin.

Li gundê Xeydayê ya Xizana Bilisê, gerîlayek bi navê Sevdîn Mutlu ji aliye cerdevanen gund ve di 6'ê mehê de hate kuştin. Pişti bûyerê 40 cerdevan îstifa kirin, 18 cerdevanen gund hîn li ser kar in. Gerîla di 7'ê mehê de li xeydayê hate vesartîn.

**7 Tebax 1993:** Di şerê nav gerîla û hêzên dewletê de, ku di navbera gundên Gurco û Kubuk ên li ser navçeya Çinarê ya A-

rin ku, keya ji aliye cerdevanan ve hatin kuştin.

**9 Tebax 1993:** Traktor pêli mayinê kir 4 kes jê mirin, 5 kes birîndar bûn. Bûyer li Çiyayê Gebarê nêzîkî gundê Dêrşew a ser Şîrnexê di 9'ê mehê de qewimî. Ên ku mirîne navê wan ev in: Abdullah Çakman, Ömer Turan, Fatma Ayrilmaz û M. Emîn Bozanlı, navê kesen birîndar nehate hînbûn.

Muxtarê Gundê Dikê ya li ser Xezexâ (Idil) Şîrnexê teví birayê xwe ve ji aliye ARGK'ê ve hatin kuştin.

Muxtar Salih Eren û Zekî Eren berê cerdevan bûn û dev jê berdabûn. Li ser xwestina ku ji nû ve bibin cerdevan hatine cezakirin.

Li Amed û Batmanê di encama cerdê kontrgerîla de 2 kes hatin kuştin û 2 kes ji birîndar bûn.

Li Amedê li Baxlara esnaf M. Sidîk Adiyaman û li Taxa Lalebey ji Süleyman Ayverdi (25) mirin. Di cerda Lalebeyê de jîniyek bi navê xwe Pınar Erdoğan ji birîndar bûn.

Li bajarê Batmanê ji, li Taxa 19 Mayısê yekî 17 sali M.T birîndar bûn. Li gundê Şenokê ya li ser navçeya Xamûra Agiriyê cerdevanek ji hêla ARGK'ê ve hate kuştin. Li Suruca Ruhayê ji bombe avetiñ mala Alî Baz, 6 kes birîndar bûn. Bûyerê Komîteya ERNK'ê ya navçeyê hilgirte ser xwe.

Gerîlayen ARGK'ê nijdek birin ser Qereqola Sancakê ku li ser bajarê Çepekkürê (Bingolê) ye. Cerd, di saet 24:00'ê şeva 9'ê mehê de pêk hat. Di encama cerdê de fermandarê qereqolê Faruk Demîrel, leşker Erkan Çîmen, Sadun Bulan mirin, leşker Haci Kaya û Erkan Dikilitaş birîndar bûn.

Erebeyen belediyê û avahiya Belediya Melezgirê ji hêla gerîlayan ve hate şewitandin. Notırnak bi xwe re birin. Berdestî si-beh ew berdan.

Dîsa li gundê Çixrik a li ser Siwêrekê, pişti cerda gerîlayen ARGK'ê pênc cerdevan hatin kuştin. Li gundê Girêsor a Siwêrekê 4 malê cerdevanen ji alyî gerîla ve hate şewitandin.

**10 Tebax 1993:** Hate hînbûn ku, Xamûra Agiriyê ji aliye hêzên dewletê ve hatiye gulebarankirin. Gulebaran di 00:30'ê şevê de qewimiye û saetek domiyaye. Pişti bûyerê 100 kes hatin binçavkirin.

Li navçeya Darahêne ya Çepekkürê mînibusek hate gulebarankirin. 8 cerdevan û lêzimên wan mirin, 10 kes ji birîndar bûn. Bûyerê gerîlayen ARGK'ê hilda ser xwe.

Li Dêrsimê li ser ketina helikopterek leşkerî, sê serbaz (subay) mirin, sê ji birîndar bûn. Li gor nûçeyen cîgahî, helikopter hatiye daxistin.

**11 Tebax 1993:** Ber bi 15'ê Tebaxê ve li metropolên Tirkîyê ji binçavkirina Kurdan didome. Li İzmîr û Manîsayê 40 kes hatin girtin. Di nava girtiyan de rîebirîn DEP'ê ji hene. Li E-denê ji, li taxên ku Kurd lê dijin, operasyon û binçavkirinê li hember Kurdan didomin. Ji taxên Denizli, Fevzi Paşa, Şakîrpâşa û Yurt'ê bi dehan Kurd hatin binçavkirin.

Li Licê, Serokê DEP'a navçeyê Halîm Kaymaz, birayen wî Awûcan û Salîm Kaymaz hatine girtin. Li Midyadê ji 2 kes, bi navê xwe Enver Doğan û Abdullâh Demîr hatin binçavkirin.

Li Hezoya (Kozluk) Batmanê 2 dikan ji aliye ARGK'ê ve hatin bombekirin. Dikanen Lezgîn û Enver Engîn, ji ber ku kepengen xwe negirtibûn hatin bombekirin.

Li Licê, pişte ku gerîlayen ARGK'ê avahiya Tekelê şewitandin hêzên dewletê êrîşî ser dikanan kirin û gelek dikanan rûxandin. Karkerék ji bi lêdana polisan bi xedarı birîndar bû. 3 kes ji bi hincta ku alîkarî didin gerîla, hatin binçavkirin.

Avahiyen Hezexê ji aliye hêzên dewletê ve, bi çekên giran hatin rûxandin. Jineke 65 sali di gullebarana leşkeran de hate kuştin. Bi dehan mal û dikan xesarê dîtin. Mala mebûse DEP'ê Selîm Sadak ji xesar dît. Gerîlayen ARGK'ê cemseyek timen taybetî xistin kemînê û di navbera herdu hêzân de şer derket. Pişti vê êrîşa gerîla, hêzên dewletê Hezexê bi çekên giran kutan û gelek dikan û avahî rûxandin.

Li Çermûkê ya Diyarbekir, li gundê Mauvend di navbera gerîlayen ARGK'ê û hêzên leşkerî de şer derket. Şer li Çiyayê Kataranî dest pê kir. Kuştin û birîndarî çenebûn. Pişti şer, leşker cerdî ser gundê Mauvend û gundê dorhêlê kirin, ji van gundan 25 kes hatin girtin. Ji ber pêkutiyen hêzên dewletê 3 gundên Farcînê gundên xwe valakirin. Gundiyen Mala Elîkê, Mala Hirmo û Dêrika Miqûre koç Farcînê û gundên cîran kirin.

Gerîlayen ARGK'ê li Culemîrgê êrîşî ser wargeha cerdevanan ê li hêla Sergele kirin. 2 cerdevan hatin kuştin.

Li Mîksê (Bahçeseray) ya Wanê, gerîla êrîşî qemyoneke cerdevanen kirin şofêr qemyonê û cerdevanek hatin kuştin, 3 cerdevan ji birîndar bûn. Gerîla serekek cerdevanen ji bi xwe re birin.

Gerîla li Hewlêra (Baykan) Sertê, nîjdi ser gundekî cerdevanan kirin. Di vê êrîşa ser gundê Kermatê de, jînek hate kuştin. Ji ber ku hêzên leşkerî dora gund girtine, der barê kuştî û birîndarîn din de agahî nîn e.

**12 Tebax 1993:** ERNK, li navçeya Wanê, "Başqale" ji bo 15 Tebaxê belavok belav kir. Di belavokê de li ser 15'ê Tebaxê

ku, destpêka şerê çekdarî yê PKK'ye tê rawestandin. Bi belavokê daxwaza kepenggitinê ji tê kirin. Pişti belavkirina belavokê, hêzên dewletê dest bi operasyonan kirin û 8 kesan binçavî kirin.

Hêzên leşkerî yê dewletê, li gundê Baqeyse ku li ser Stewrê (Savur) ya Mêrdînê ye, qetliamek pêk anîn. Di êrîşa leşkeran de gund bi tevayı hate şewitandin; 5 gundi ji, ji aliye leşkeran ve hatin kuştin.

Li Licê, Serokê DEP'a navçeyê Halîm Kaymaz, birayen wî Awûcan û Salîm Kaymaz hatine girtin. Li Midyadê ji 2 kes, bi navê xwe Enver Doğan û Abdullâh Demîr hatin binçavkirin.

Li Hezoya (Kozluk) Batmanê 2 dikan ji aliye ARGK'ê ve hatin bombekirin. Dikanen Lezgîn û Enver Engîn, ji ber ku kepengen xwe negirtibûn hatin bombekirin.

Li Licê, pişte ku gerîlayen ARGK'ê avahiya Tekelê şewitandin hêzên dewletê êrîşî ser dikanan kirin û gelek dikanan rûxandin. Cendekîn leşkeren kuştî li Nexweşaneya Mêrdînê ne. Li gor çavkaniyan, ji leşkeran gelek ji birîndar hene û birîndaran rakirine Nexweşaneyen Diyarbekirê.

Gerîlayen ARGK'ê cerdî ser şantiya "Karayolları" ya ku li ser riya Erxenê û Diyarbekirê ye kirin. Gerîla grayder û qemyonek bi temamî şewitandin, avahiya bêtêlê ji xesar dît. Xesara dewletê zêdeyi 5 milyarî ye. Pişti cerda gerîla, hêzên dewletê 5 karkeren şantiyeyê girtin birîcaviyê.

Li Amedê, li Taxa Şehîlikê, xwepêşandanek qorsan pêk hat. Xwepêşandan ji bo pîrozkirina 15'ê Tebaxê çêbû û sloganen wek, "Biji PKK, Biji ARGK, Biji ERNK û Biji 15'ê Tebaxê" hatin avetîn.

Li gundê Şîrnexê, êrîşen hêzên dewletê didomin. Balefirê leşkerî, gundê Biyava bomberan kirin. Di bombebaran de 2 mal isabet girtin û gundiye bi navê Mehemed birîndar bû.

Gundê Hespîstê ji, ji aliye leşkeran ve hatiye dorpêkirin. Li gor agahdariyan, gund bi tanqen Almanî hatiye gulebarankirin û hin mal şewitine.

Li Hezexê, zarokek bi bombelek ku leşker ji cihê nobeta xwe avetîne kolanê (cadeyê) hate kuştin. Karmendên Qadastroye yên ku li Xinis û "Pınarê" yên Erzêromê dixebeitin û ji aliye gerîlayen ARGK'ê ve hatibûne revandin, hatin berdan.

Li nêzî "Başqaleya" Wanê, di şerê navbera PKK û hêzên dewletê de, serbazek (asteymen) hate kuştin. Hêzên leşkerî bi firokeyan leşker kişandin cihê bûyerê. Pişti vî şerî, timen taybetî li "Başqale" yê gulle reşandin hewayê.

Riya 13'ê Tebaxê, serê sibehê hêzên dewletê agir berdan daristanen dora Gundê Baqirdê ku li ser Misircê ye. Agir heta saeta ku rojnameya me kete çapê nehate tefandin û her diçû dor fireh dibû. Hêzên dewletê derdora mintiga ku agir berdabûne girtin û nehiştin ku agir bitefinin.

# Rûreşîya KT'ê: Çekên Kîmyewî

**Navenda Nûçeyan-** Li hember gerila, KT (TC) çekên kîmyewî bi kar tîne. Ev yek bi fotografen 19 gerila yên ku li Çiyâyê Nûrheqê hatibûn kuştin îsbat bû. Heta niha ji aliyê KT'ê ve gelek caran çekên kîmyewî hatibûn bi-karanin. Lî ev yek bi belge ne-hatibû îsbatkirin. Fotografen gerila yên ku li Nûrheqê bi çekên kîmyewî hatin qetilkirin wek bel-geyeke dîrokî, rûyê reş ê KT'ê derxiste holê.

KT heta niha bikaranîna çekên kîmyewî încar dikir. Weke tê zanîn çekên bi vî rengî, bi peymanen ser ên navneteweyî hatibûn qedexekirin. Lî KT wek peymanen din ku li ser mafen mirovanî imze kiribû û tim ihlal

dikir, guh nade vê peymanê ji û li hember gerila bi giranî bi çekên kîmyewî ser dike.

Cendekên 19 gerila yên ku li Nûrheqê bi çekên kîmyewî hatibûn qetilkirin, ji ber ku bi temamî şewitibûn, ji aliyê malbatêwan ve nehatin nasîn û bi destê Belediya Mereşê hatin veşartin. Ji van cendekan ê Kamber Yavuz, ji aliyê malbatâ wî ve, ji gorê hate derxistin û li gundê Kirkiliya Pirrin (Adiyaman)'ê hate binaxkirin. Di vê navê de, fotografen cendekê Kamber Yavuz ku hemû şopân çekên kîmyewî li ser hebû, hatin kişandin.


Weke ku ji van fotografan ji diyar dibe, dê KT nikaribe vê rû-reşîya xwe veşere û dê wek ber-



Kamber Yavuz



Cendekê Kamber Yavuz, cara pêşî ji aliyê malbatâ wî ve nehatin nasîn. Lewre bi çekên kîmyewî laşê wî bi temamî şewitibû.



Ferhat Tepe

**Navenda Nûçeyan-** Kuştina nûçevanê Özgür Gündem'ê Ferhat Tepe, bi beyanen hin şahidîn bûyerê, eşkere bû ku li Amede di avahiya cendirme de pêk hatiye. Ên ku bûne şahidê kuştina Ferhat, bi xwe ji di wê avahiye de bûne û niha li Girtigera Amede girtî ne. Ji van kesen

## Ferhat Tepe li avahiya cendirme hate kuştin

Mümtaz Çerçel, Nizamettin Almas, Rıza Demirtaş, Emîn Tokdemir, Mecît Tokdemir, Bahri Elçi û Mixdat Yaşar, ji girtigehê daxuyandîn ku Ferhat Tepe ji bi wan re dîbinçaviyê de bûye. Li gor beyana van kesan, işkenceyên dijwar li Ferhat Tepe di hate kirin û wî ji binçaviyê din cihê digirtin. Pişti 3'yê Tebaxê ji, edî tu kesi ew li avahiya cendirmeyan nedîtiye. Weke tê zanîn cendekê Ferhat Tepe roja 4'ê Tebaxê li Gola Hezarê ya Mazreyê (Elezîz) hatibû dîtin.

Ji kesen ku bi Ferhat Tepe re di binçaviyê de bûn Mümtaz Çerçel, li ser Ferhat Tepe wihibî: "Ez 28 roj li avahiya ku li piş Subeya Eskeriyê ya Diyarbekirê di binçaviyê de mam ji ber ku ez di sala 1990'an de dî-

sa li vîr 14 rojan di bin çav de mabûm ez vê avahiye baş dîsim.

Ferhat Tepe li dû me anîn vê derê. Mêjû baş nayê hişê min (dibe ku 27'ê mehê an ji 28'mehê be.) Serbaz, ji ber ku ez ji rojnamevan bûm, qerîn kir got, "Ulan rojnamevaneki din ji anîn." Ferhat kelemçekir bû. Dema ku derdixistin avrêye min ew didit. Bi deriyê hucereya 5 numere ve hatibû kelemçekirin. Jê pirsin ku ji kijan rojnameyiye. Wî ji got "Ez nûçevanê Özgür Gündem'ê me." Ew ji, ji peyva "Özgür" (azad) hêrs bûn lê dan. Ferhat herdu rojîn pêşin xwarin nexwar. Jê re digitin "Tu grevê dikî," û lê didan. Dû re rojê çarîkek nan dixwar. 3 caran ew tazî kirin û birin cihê

işkenceyê. Min ji dengê wî fêm dikir ku, ceryanê didinê. Pişti işkenceyê digot "milê min na-girin." Di navbera me de 10 mitro hebû.

Min ew li ber derê hucreya 5 numero didit. Desten wî ji kelemçeyê qet derneexistin. Di dema işkenceyan de, pirsin ku jê dikirin, me dibihîst. Ferhat digot: "Ez 19 sali me, ji 2 mehan ve ye li Özgür Gündem'ê dixebe-tim. Min 3 mehan qursa rojnamevaniye dit. Milyon û nîv meas distinim."

Pişti 3'yê Tebaxê, me ew hew dîtin. Min ji itirafkarek pîrsî, ji min re got, "Wî birine cihekî din."

Pişti mehkerme min a 9'ê Tebaxê, ez girtim û xistin girtî gehê. Li girtigehê min ji rojna-

meyan xwend û hîn kir ku Ferhat hatiye kuştin. Min ew ji wêneyen wî nas kir."

Girtiyen din ên ku bi Ferhat re di binçaviyê de bûn ji, beyan kirin ku, gelek caran bi Ferhat re rû bi rû bûne, ji axaftinê wî û ji pîrsen işkencekaran navê wî û bajarê wî hîn kirine."

Şahidiya van kesen bi Ferhat Tepe re di binçaviyê de bûne, îspat kir ku, ev cinayet bi destê hêzen dewletê pêk hatiye û Ferhat li Diyarbekirê, di Avahiya Cendirme de bi işkenceyê hatiye kuştin.

Li ser kuştina Ferhat Tepe, ji gelek saziyen navneteweyî mesajen piştigiriye hatin Özgür Gündem'ê û di van mesajan de, qetliamîn bi vî rengî hatin protestokirin.

ku, polis binçavîkirina Aysel Malkaç qebûl bikin.

Li Enqereyê ji, mebûse DEP'ê Sedat Yurdas, tevi heyetek ji nûneren saziyen demokratik ve bi Wezirê Karêne Hundirin Mehmet Gazioglu re hevditinek pêk anîn û dîtina Aysel Malkaç daxwaz kîrin.

Pişti revandin û kuştina Ferhat Tepe, bûyeren bi vî rengî yên li hember rojnamegeran sifitir bûn. Nûçevanê rojnameya Aydinlik'ê yê Tetwanê Şehmûz Günç ji winda ye. Ev rojnamevan ji, ji aliyê polisên sivîl ve hate revandin û binçavîkirina wî ji, ji aliyê Emniyete Tûxê (Tetwan) ve tê înkarkirin.

Ev ji nîşan dide ku, ev daxuyanî ji aliyê rayedaren emniyetê û dîplomatîn ve hatiye amadekirin.

Ji keynî tûristen Fransız, tûristen Ingiliz; David Rowbottom û dergisiya wî ya Avûsturalayî Tania Janemiller ji, di 10'ê Tebaxê de ji aliyê gerîlayen ARGK'ê ve hate berdan. Herdu tûrist di nav qemyonetekî de, li ser riya Bilîs-Mûşê, li nêzîkî Norşînê (Güroymak), ji aliyê leşkeren Tirk ve hatin dîtin. Pişti kontrolkirina tendurustiya tûristan, ew şandin Wanê, ji wir ji şandin Enqereyê.



Aysel Malkaç

## Nûçevana Gündemê winda ye

**Navenda Nûçeyan-** Nûçevana Özgür Gündem Aysel Malkaç li nêzî Navenda Gündem'ê, ji aliyê polisên sivîl ve hate revandin. Emniyeta Stenbolê, binçavîkirina Aysel Malkaç încar dike. Lî li gorî şahidîn ku bûyerê dîtine; Aysel Malkaç ji aliyê polisan ve hatiye revandin.

Windabûna nûçevana Gündem'ê Aysel Malkaç, ket roja 9'an. Tevi hemû serdan û lêgerînê birêvebirêن Özgür Gündem'ê hêzînîn.

dem'ê heta niha der barê Aysel Malkaç de tu agahî nehatine gitin.

Kuştin û revandinê ku li ser xebatkarên Özgür Gündem'ê têne meşandin, ji aliyê saziyêr. Kurd, Tirk û navneteweyî ve tê protestokirin. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî û PEN'a Navneteweyî, li ser kuştina Ferhat Tepe, revandina Aysel Malkaç û pest û pêkutiyê li ser Özgür Gündem'ê, bîryara livbaziyê lezgînî dan. Li

gorî vê bîryarê herdu saziyên navneteweyî, ji rayedaren KT'ê re na-meyen protestoyê şandin û dîtina Aysel Malkaç xwestin. Serokê Komleya Rojnamevanen Sînor-nas ên Fransız Rober Menord ji, ji Serokkomara Tirkîye Tansû Çiller re nameyek şand û dîtina Aysel Malkaç daxwaz kîrin.

Li aliyê din, Berpirsiyare Giştî ya Özgür Gündem'ê Gurbetelli Ersöz, bi cîgirê waliyê Stenbolê re hevditinek pêk anî û daxwaz kîrin.

Di civîna çapemeniyê li dar xistin. Tûristen Fransız di civînê de dîtinen xwe wiha anîn ziman: "Bi armanca siyasi revandina tûristan nayê qebûlkirin. Ji ber vê yekê pêwîst e tûristen Avûsturalayî û Ingiliz ku ji aliyê ARGK'ê ve hatiye revandin, bêne berdan." Berê ji, ji bo rîzgarkirina tûristan Serokê Giştî yê Weqfa Yekitiya Bijîjkîn Cîhanê Bernard Granjon, Serokê Giştî yê Weqfa

## ARGK'ê tûrist berdan

Mafen Mirovan ê Tirkîye Yavuz Önen û ji rojnameya Turkish Daily News İsmet Îmset heyetek ava kiribûn. Ev heyet sê caran çubû herêmê. Lî belê, li herêmê operasyona ku ji aliyê hêzînîn dewletê ve dom dikir, rî ne dida heyetê bigihiye tûristan.

Di civîna çapemeniyê de ji dîtinen xwe guherandin û gotin ku: "Ji bo armanca siyasi revandina tûristan nayê qebûlkirin."

# PÊNÛS

Amed Tigris



## PKK daxwaz û hêviyên Kurdan ên sed salan bi cih tîne

**B**i sed heta bi hezar salan in ku Kurd xwedî daxwaz, hêvi û xeyalêne mezin in. Dema mirov li rûpelêne diroka Kurdistanê temaşe dike, ji 1800'î vir ve Kurdan li dijî dagirkeran serî hildane. Lî, mixabin hemû serhildan têk cûne. Sedemîn têkçûna hemû serhildanan jî hema hêma wekî hev in an jî gelekî nêzîkî hevdû ne: Serokatî sist û jar bûne. Yekîtiya Kurdan tu carî çênebûye. Serhildan di herêmeke teng de mane. Ji bin tesîra mîr, şêx, pîr an axayekê derneketine. Yanî serhildan hemû Kurdan berhev nekirine. Hest û şiyarbûna neteweyî tune bûye an jî kêm bûye. Serokatî bi xwe û bi gelê xwe ne bawer bûne. Ji bo tiştekî biçûk serî hildane û dîsa ji bo tiştekî biçûk jî dev ji serhildanê berdane. Ew jî aliyê dîjîmin ve hatine xapandin, an tesîlîmê dîjîminê xwe bûne. Dîjîmin her dema ku ketiye tengasiyê Kurdan li dijî Kurdan bi kar anîne...

Ji ber van sedeman daxwaz, hêvi û xeyalêne Kurdan bi sed salan heta bi hezar salan di ser, dil û zikêne Kurdan de mane. Her ku çi bûye pê, "axxx" û "offf" kirine heta roja iro. Lî, iro di pêşengiya PKK'ê de

**Daxwaz, hêvi û xeyalêne Kurdan bi sed salan heta bi hezar salan di ser, dil û zikêne Kurdan de mane. Her ku çûye pê, "axxx" û "offf" kirine heta roja iro. Lî, iro di pêşengiya PKK'ê de gav bi gav, yek bi yek ew dcxwaz, hêvi û xeyalêne hezar salan dibin rastî. "Axxx" û "offf" kêm dibin û "oxxx" zêde dibin. PKK'ê li ser bingehê neteweyî û çinî li seranserî Kurdistanê heta di nav Kurdêñ cihanê de rôexistina herî nûjen û militan ava kir. Bi yekîtiya ERNK'ê Kurd bûn neteweyê ke bi rôexistin. Rôexistinê herêmî, eşîrtî, mezhebi, dînî heta yên klasik ji navê rabûn. Ne ku bi tenê Kurdêñ vê herêmî an jî vî parçeyî, ji Beyrûdê heta Qefkasyê û Qazakîstanê, ji Hindîstanê**

heta Kanadayê hemû Kurden ku li ser rûyê dînyayê belav bûn bi rôexistin kir. PKK'ê bawerî bi gelê Kurd anî. Hemû hesabêne xwe li ser gelê Kurd kir. Di rojîn herî teng û xerab de hêviya xwe bi hinek dewlet û bi taybetî bi Rojava ve girê neda. Wê ji xwe re gelê Kurd û çiyayê Kurdistanê kir serkanî, bingeh û pişt da wan. Hêvi, gel û çiyayê Kurdistan bûn.

Bi rôexistina gerîla ARGK'ê hêz û militâniya xwe bi cihanê da nîşan dan. Hebûna Kurd û Kurdistanê da qebûlkirin. Artêsa Tirk a "mezin û qehreman" anî ûmanê. Efsaneyê mehmetçîk ku qet têk nedîcû û dewleta Tirk a ku pirr mezin bû, ew bû pênc pere! Dewleta Tirk ketiye bin dest û lingan.

Ser dakete nav axa Tirkîyê jî. Tûrîzm û endustriya Tirkîyê li ser têkçûne ye. Di warê weşanî de jî gavên herî mezin hatin avêtin. Çapemeniya Kurd ava kir. Di nav Kurdan de hêzen milîs hatin amadekirin. Ji bo yekîtiya neteweyî rôexistinê misilman, êzidî û elewiyan hatin organîzekirin. Heyva Sor hat damezirandin. Kurd-Ha di xebatê de ye. Enstîtu, Weqif, Naven-da Çanda Mezopotamyayê, Yekîtiya Rewşenbirêne Welat-parêzêne Kurdistanê hatin avakirin. Bi hemû hêz û grübêne Kurdistan re hevkarî û xebatêne eniyê dest pê kir. Bi Başûr re her ku diçe têkilî baş dibin.

Niha daxwaza Kurdan a acîl istasyonêne radyo û TV'yan in ku li seranseri welêt û Ewrûpayê weşan bikin. Kurd naxwazin êdî radyo û TV'yan dîjîmin guhdarî û temaşe bikin. Kurd dixwazin meclisekê wan û neteweyî hebe. Nûnerên wê di qada nav neteweyî de Kurdan temsîl bikin. Pişti van daxwaz, hêvi û xeyalêne Kurdan dewleta Kurdistanê dixwazin. Êdî em netewe ne û neteweyekê bi rôexistin in. Ber bi azadiyê ve dimeşin. Tu kes û hêz êdî nikare me bide rawestandin. Na!

# Qeçekê no hozanvan Yahûdî bê pî: Roald Hoffman

Farûk Yakûp

(1937...)

Qandê çicî mi va "qeçekê do hazonvan, Yahûdî yo bê pî?" Ci wext pî yê Hoffman yeno kişteeni, Hoffman bi xwi (xu) qeçek biyo. Seri 1937 di, Polanay di sûk da Zaloczowa di hama dinaya.

Amnani ser 1941 di, pî yê ci, maya ci o bi xwi yenê tepişteni. Eskerê Hitler ûnan nişenê kampê hêşira. Zey ma hondirawa yê (şîrî) Hoffman di zî zanê ki pî yê ci waşto ki kamp ra biremo. La nêbiyo û ameyê kişteeni. Hema dinya zano ki çendi Yahûdî bêşûal ameyê kişteeni. Aqîbetê ûnan heme dinya di û ma di zî yeno zaneyeni.

Rojawa di qederê ma û Yahûdî zey pêyê. Tarîxê ma zey pêyo, qederê ma eyniyo. Verê misirî, dim a "Ereb (bi İslamyeta) û dim a Hitler (nazîzim) biyo tofana ser yê ûnan. Senî 'Erebî, Tirkî, Farîsî biyê bela yê seredê ma, Yahûdiyan zî wûnî' Ereb, Osmanî, İslamyet û Rûma re zaf zilim anto.

Pî yê Hoffmanni ser 1943 di yeno kişte û dim a maya ci o bi xwi û xirûbê do Yahûdî kampê hêşirey ra remenê, nezdîyê des mengî şar ûnarê wehêrey keno û nimneno. Nezdîyê new mengî zî bostanan di qaçak kar kenê. Hoffman 7 (hewt) sere bê pî maneno, o zehmetey û hêsi ki ûnan antê,

ey re beno şewqê do gird, îlhamê do gird. Kampti bi çimanê xwi va viñeno ki senin insanî yenê kişteeni, senin işkence kerdeni.

Hoffman nika New York di jiyêno û heta nika 3 (hîrê) pirtûk nûşnawé.

1. The metamict State... (Dewletê da matamatîkin)

2. Gaps and veges.... (Qulikê sinori)

3. Memory effects... (karê efekte meji)

Pirtûka xwi yê Memory effects, 1991 di çep kerdo. Hondirawa yê (şîrî) Hoffman hezkerdeni êşî, hesret û jiyan ra gûniya xwi gîno. Zey zaf nîştoxandê Yahûdî o zî hozanê êşano.

### AMNANI

Dim a wextê do derg heme tepe amey

Ez wûnî zana ki lej qedyâ bî

Ki tu nêmerd bî, pî

Çi wext şima piya sûk di şî

Ez wûnî bawer keno, to xwi

înan ra azad kerd

Aya tu bî ki rayid di remaynê.

Jewna bî ûnan kişti.

Rojê

Ti do bêrê,

Qaçaxî

Bi cîna parce biyaye û tu do

mi rê vacê

istannikî.

Qandê mi, o dar ki tu xwi vûca di nimna bî

Rojê tu peydê bêrê,

Dim ra tu bi mengana ay rayêdan ser o şî

Bi Rûsyâ

Ü ci wext to mi xepêna

Ü tu niyamê, maya xwi ra waşt

Jewna fin vaco

Çiç amebî to sere

Ü mi xwe kerd herûnda ay

Yahûdî,

Aw Yahûdî ki to îxbâr kerd bi,

Ax pî yê mi,

O bi ki cayê tifing dê to nawna

Ü planê to xirab kerd

Ma o nêbi waşt ki tu kozikê

xwi ra bivîciyê teber

Mi èyê va, tu ci qehreman bî,

pî yê mi,

Mi xewni vînay, ki ez bîbiya

weherê erdi

Ez şaya pûmpa bikere wotqa

Miyanê gûnî, bêvernî girote

Ü polisê Úkrânî

Ki tîvingê xwi werzana

Çi wext tu xwi est ser eskerê

SSI

Ü ci wext, o zî nêbî

Axxx... pî mi

Pencerê mi heme girotî

Ü heyal kerd zey ûnan cayê

girote akerê

Cimê xwi bîdi cayna,

Kî è nêveynê tu dirbetinê

Kî è bêveng nêşirê,

Ser a zî to di finî namê merda

mi va

### Swêdî ra açarnayışı

# Zonî ma di 'hunerî gel'

### Boxlonij

Zon zê nêftî wû. Heger mefti çinyebû, ber zî anîbenû. Meftê zon zî nuştiş û. Zon bi nuştiş e-ravê şinû. Merdum bi zon kultur xwi aravê benû. La belê zonêko tyemondayı nî. Zonêko zelal û sistematiğ hewce wû. Heger zon zelal û sistematiğ nyebû, kultur zî benû kulturêko temondayı û bye qaliti. Ocax myonî civat rî zaf xirav û.

Adawara mi waşti ina nuşte xwi di basî berhemonî gel bikêrî. Ku in berhem tayni xisusiyetonî literaturî ma nîşon donî. Myonî civatî ma di estanok, meselok, viçonik (tiştanok), yařî, vatêvînî, qılıluk, kelom û hçb estî. In hemû zî formî literatur dê. Adawara zî besî literatur yêni zonayış. Bi qeyedko bîn zî esasonî literatura çend hev i. Hunerû newi inyon ser benû berz. Xisusiyetî inyon zî inê: In hêti mîlet ra omê vatîş û anónîm. Herçend hunermend qalibonî xwi bidû hunerî xwi a newi zî.

nû hêti komya amê vatîş. La belê ma zonî ku, in malî mîlet e. Yanû warî yin mîlet e.

Ez otîr bawara ku besî literaturî ma, ku myonî Kurdan di amê viraştiş, bi seseron bi fêk (dev) û diyalekt teslimî qernon bî. Gernêk bi fek teslimî qern bîn kerd. Çimkî bi zonî Kurdi nuştiş gelê erê amo destpêkerdiş. Ma hemo zî nîzonî yelonî (çavkaniyonî) nuşton di çendêka diya in berhemon.

Gwerê baweriyê mi, civatî Kurdon di lîtaraturî ma wî anónîmî gelêk dewlemend û. Çimkî in girêdayê avayê civatî ma wû. In berhemon di him ironî, him şabyayış û epik, him zî lorî û lyrîk estû. Civatî Kurdon gelêk dejo û bindêstî zaf diya. Sér in dejayışa zî dêrd û kul xwi formî literatur di ardî zon. Hunerê ku ika hêti hunermen-dona virazenû, binî xwi literaturî ma wû anónîm ra genû. Herçend hunermend qalibonî xwi bidû hunerî xwi a newi zî.

*Bi dengbêj Beşîr Botanî re li ser heyranokan sohbetek*

# 'Heyranok jiyana berê ya gundan bû'

## Bêrîvana Dêrsimî

Rêzdar Beşîr Botanî heyranok çi ye?

- Heyranok, gilî û ga-zinêv evînê ne û sê rengê wê hene.

- a. Heyranoka giştî,
- b. Pesteya heyranokê,
- c. Heyranoka dîwanî.

Ev sê tişt(reng) bi denge-kî zelal têne strandin. Ev gotinêv heyranokê yêñ keçan e û naveroka wê jî ew e:

1. Hêvî, evîna mezin, sozdan, xwestin û daxwaz, xwegerîkirin, paşerojê û hevdîtin.

2. Jiyana zehmet, tenêbûn, nexweşî, derd û birîn.

3. Dûrî, eskerî, xatirxwestin, xerîbî.

4. Rewşa evîndarêñ berê.

5. Zikreşî, xeber û zilm.

6. Xapandin û poşmanî.

7. Cejn, dem û munasebeten dînî, sondxwarin, rewşa pêxemberê ku der-dek hatiye serêñ wan.

8. Qedirgirtin, benda mizgînî û bersiv.

9. Nexş (xarîte) û dengen tebiâtê.

10. Gotinêv mezinan û her wekî din.

Li kîjan mintiqêñ Kurdistanê keçen Kurd heyranokan dibêjin?

- Li sê mintiqan keçen Kurd heyranokan distrin. Botan, Behdînan û Hekarî. İro heyranok roj bi roj namîne. Di berheman de ez dixwazim kom bikim û bi-parêzim. Ez nêzîkî 80 heyranok ji dayîk û mirovên xwe fêr bûme. Heyranok a keçen 12-15 salî ne. Heyranok jiyana berê li gundan bû.

Ji ber çi heyranok li Kurdistanê namînin?

- 1. Ji ber şerîn mezin û giran li welêt.

2. Kurd gundêñ xwe bi cih dihêlin û diçin bajaran. Keç li wan deran dest bi distanê dikin. Di gel vê jî sî-nema, radyo, televizyon û vîdyo jî hene.

Mînakek ji beşa

heyranoka giştî

## DELALO

Delalo, ci agirekî dijwar kete Beriya Mêrdînê

Ji pê di pê da

Delalo, bila neketa Kanê Sêstûnî

Rima delalê min tê da.

Delalo, minê daqçîkê jî nava şemaran

û beqan ra bineqanda Delalo, taximê Sing û berê xwe bideqanda.

Hawar e, minê navê delalê dilê xwe daniye tê da Heger fediya min ne ji bab û bira ba minê rûnişa Di bedêla darê rimê da.

Ji bo pesteya heyranokê jî mînak:

## EZ YA TE ME

Ez ya te me, ya te me Eliyo lawo ya te me Ez taze me, taze me Eliyo lawo ya te me Ez dîn im, dîna te me Eliyo lawo ya te me

Aşıqa bejna te me Eliyo lawo ya te me Ez bûk im, bûka te me Eliyo lawo ya te me

Hişyar be li hêviya te me Eliyo lawo ya te me Çar sala li benda te me Eliyo lawo ya te me

Ji heyranoka dîwanî re jî:

## KURKO DÎNO

Kurko dîno next nebit min pê bînî

Min got heke eşîret nebi min birevînî



Beşîr Botanî

Hawar, hawar, ma tu çîma li kilêsa babê xwe narînî?

Hawar, hawar, hawar.....

Kurko dîno, natepitî

Te ci ye li derê xaniyê me dixebeitî.

Heger zêde kî dêcime nik, qeymegamî, nik zabiti

Hawar, hawar, hawar, .....

# Di stranan de pesindan

## Jîr Dilovan

Di stran, kilam û dîlokêñ Kurdi de, pesin û wesifdana keçikan, xortan, mîran û jinan ci-hekî bi rûmet digire. Ku li ser van wesifdanan lêkolîn û lêgerîn çebibin, ez bawer im ku di tu çand û ziman de dewle-mendîyeke wilo nîn e. Ezê di vê nîvîsa xwede mînakekê ji dengbêjê hêia, **Miradê Kinê** pêşkêş bikim.

Miradê Kinê di strana **"Seyrê û Eliyê Memed"** de li ser Seyrê wesifdaneke mezin wiha dide:

"Dibêjin Seyrê Xatuneke cawa ye?"

Yeka ser bi zêr e  
Kofî kîl e  
Awir şewat e  
Kemax kîvroşk e

Nazik e nazelîn e  
Li nav milan cil û çar kezî ne  
Serê keziyan bi aqûd û zemrûd û porangê bajari ne  
Tu dibêje te di ava zîv û zêr hilanîne  
Wan sêvîn geliyê Meletê  
micala memikê wê nîn e  
Binê wan spî ne  
Serê wan sor in, weke  
derzî ne  
Wan marêñ nava dehla  
Bunisra micala fetlê  
keziyên wê nîn e  
Xatûneke çavres e devbigul e  
Awir şewat e, gelekî  
xwînşîrîn e  
Ku her roj bibêje yekî bi  
"Sebab û kurê Sawo"  
Yekî bibêje "Weyla min  
bi qurhanê ev xebera te  
ci xwes û ci şîrîn e"  
Bawer bike yê ku ew  
nazelîn e.

## Sêva dil

Ji bo şehîd Cemalê Elibapîr

Eger ji çiya hûn bipirsin

'Cemal' kî ye?

Lûtke xwe nîşanî we dide!

Eger ji çem hûn bipirsin

'Cemal' kî ye?

Dibê guhê xwe bidin

Xûşe xuşa pêlén min!

Eger ji baxan hûn bipirsin

'Cemal' kî ye?

Dibê gulên ser guliyê min bêhn bikin

Eger ji jar û belengazên

Vê Kurdistanê jî bipirsin

'Cemal' kî ye?

Hemû bi hev re

Destêñ xwe yêñ cepê

Dafînîn ser sêva dil.

**Şîrko Bêkes**

**Wergêr: Niwa Hebîb**

**Lûtke:** Bandev, cihê herî bilind

# Nirxên 15'ê Tebaxê



15 Tebax 1993, Edene

## Seyfettin Özcan

Pirr germ e. Bi germa xwe tê zanîn nav û dengê germa meha Tebaxê. Gava Tebax tê gotin, germa havînê bi bîra mirovan tê. Gava Pazdehê Tebaxê tê gotin, Serhildana Egîdêne Kurdistanê di mejiyên mirovan de cih distîne. Giran e germa heyva Tebaxê li Kurdistanê. Gava lê dixe erda çolan diqelişine.

Her meh, xwedî rûmeteke di demâ xwe de. Lê belê meha Tebaxê xwedî maneyeke cuda û xwedî rûmeteke giranbuha ye di Kurdistanê de. Ji ber ku Tebax di Kurdistanê de ne bi germa xwe bi tenê navdar û xwedî rûmet e. 15'ê Tebaxê bi destpêka şikandina nîrê zordariyê, bi qetandina zincirên koledariyê, bi cirandina reşahiya tarîtiyê, bi guhertina giyana bindestiyê, bi windakirina şexsiyeta qelsîtiyê û destjêberdana (terikandina) tirsonektiyê ji xwedî rûmet û bi nav û deng e.

## 15'Ê TEBAKÊ SERHILDAN E

Dirok: 15 Tebax 1984. Destpêka vebûna peleke nû di dîroka Kurdistanê de. Bi qumandariya serlesker heval

Egit li Dihê (Erûh) û li Navşanê (Şemdinan) bi navê HRK (Hêzên Rizgariya Kurdistanê) bi livbaziyan gerîla û di bakurê Kurdistanê de bi destpêkirina şerê çekdarî re, ew bêdengiya ew qas salan, ew bêdengiya nerind û ew bêdengiya bêşereftiyê xerab bû û dawî lê hat. Pelek nû vebû di dîroka Kurdistanê de, jiyanek nû dest pê kir di bakurê Kurdistanê de û rojek nû hilat li ser xaka Kurdistanê û ji gelê Kurd re.

## 15'Ê TEBAKÊ JÎN E

Lewre em ew birînên kûr, ew birînên xedar ên sed salan, birînên gelên Kurd, dest bi vebûnê kir, ew zimanê ku bi salan hati-

bû girêdan, ew zimanê lal, ew zimanê dewlemend zimanê Kurdi, dest bi peyvînê kir. Ew mejiyên ku bi sed hezar salan bi

jênga bindestî û mêtîngîhî hatibû meşandin dest bi vebûnê kir. Dest bi dîtinê kir wan çavênu ku nirx û berjewendiyen xwe yi neteweyî û civakî nedidîtin.

## 15'Ê TEBAKÊ HÊVÎ YE

Em di salvegera neh saliya 15'ê Tebaxê de ne. Ji 15'ê Tebaxê 1984'an heta iro neh sal derbas bûn. Dem bi xwe ne demeke dirêj e. Lê belê pêşketin û guhertinê di wê demê de li Kurdistanê çêbûne gelek mezin, girîng û bêqiyas in. Ji hemû hêlan ve gavêne gelek mezin hatin avêtin. Fersendekî dîrokî ket dest gelê Kurd. Bi taybetî di bakurê Kurdistanê û bi gelêmperi ji di her çar hêlén Kurdistanê de zanatiya ji hêlén neteweyî, siyasî, civakî, çandeyî û wêjeyî ve bi şeklek pirr maqûl û xurt pêş ket.

Me gelek cejn derbas kir/  
Li ser çiyan/ Tî û birçî/  
Em gelek cejn jiyan/ Li pişt têlê rêsayî/  
Di zîndanan de/ Me gelek cejn dît/  
Li haf mirinê/ Lê belê min qet nedît/  
Wek 21'ê Adarê lîvok/  
Wek 15'ê Tebaxê germ.

Di riya rizgarî û serxwebûna Kurdistanê de gavêne pirr qewîm û fireh hatin avêtin. Baweriya gelê Kurd a serfirazî û serkeftinê ku gelek car hatibû şikandin, ji nû ve xurt

bû. Riya şerefê û bêşereftiyê cuda û kifş bû. Tirsa jiyanâ bêşereftiyê giran bû û tirsa mirina nemir winda bû. Ew giyana (rihê) welatparêziyê ku bi salan qels bûbû û şikes-tibû, bi raperîna 15'ê Tebaxê re xurt bû û bandora (tesîra) wê da hemû aliyan Kurdistan û heta Rojhilata Navîn.

## 15'Ê TEBAKÊ SERKEFTIN E

Ew Kurdê ku bi salan hati-bû înkarkirin û ku navê wî hatibû jibirkirin, ew Kurdê û ji Kurdistiya xwe fedî (şerm) dikir û ditirsiya bi 15'ê Tebaxê re bi şeklekî serfirazî û bi şeklekî welatparêzi xwedî li Kurdistiya xwe û li nirx û

mafêne xwe  
yêneteweyî  
û civakî der-  
ket.

Ew tore û  
rêzikîn (qeyde)  
ji hêlén  
mêtîngîran  
ve ya ku li jor  
berjewendîn  
mêtîniyê hati-

bûn çekirin, ji binî ve hatin  
avêtin. Bingeha wî li gor ber-  
jewendiyen Kurdistanê  
serbixwe hat avêtin.

## 15'Ê TEBAKÊ

### FERSENDA DÎROKÎ YE

Ew çand, wêje, huner (pîşê) û nirxên gelê Kurd ên li ber parçebûn, belavbûn û windabûnê bûn, bi raperîna 15'ê Tebaxê re ji belavbûn û windabûnê xelas bûn û gihîstîn nirxên xwe. Ew raman û rêzikîn ku ji hêla dijminê gelê Kurd ve dihatin rêvebirin, ew raman û rêzikîn çewt, ew raman û rêzikîn li gor berjewendiyen mêtîni û li dijî berjewendiyen şoreşa Kurdistanê dihatin meşandin, bi raperîna 15'ê Tebaxê re felişin û weke her tişte din ew jî, ji bo berjewendiyen şoreşa Kurdistanê hatin avakirin.

### 15'Ê TEBAKÊ HÊJA YE

15'ê Tebaxê; dawî anî li bêdengiya çiyan. Ew çiyayê bilind, ew çiyayê navdar û ew çiyayê ku iro ji gerîla re bûye cih û war. Cûdi, Herekol, Zagros, Nemrût, Ararat, Sîpan, Bagok û Gabar kemi-lîn bi bejn û bala Egîdan.

Xweşî anî li deşt û zozan-an. Ew deşt û zozanê hêja û ew deşt û zozanê rengîn. Deşta Mûşê, Heran û Şeref-dîn. Xemîlin bi meşa pêşmergeyên bengîn.

Dawî anî li melultiya çeman. Ew çemên dirêj, ew çemên navdar û ew çemên sor bûn bi xwîna şehîdan. Munzûr, Hêzil, Xabûr, Zap, Dicle, Ferad, Aras. Ew çemên giyana Mezrabetan, ew çemên jiyan didin xaka Kurdistan. Iro bi xuşe xuş û bi guşe guş diherikin ber bi azadiyê, bi xwîna şehîdan.

### 15'Ê TEBAKÊ MIZGÎNA SERXWEBÛNÊ YE

Belê raperîna 15'ê Tebaxê girîng e, serhildan e, jîn e, fersend e, hêvî ye, serkeftin e, vejîna nirx û berjewendîn neteweyî û civakî û şoreşgerî ye. Mizgîna serxwebûn û rizgariya Kurdistanê ye.

Ew nirxên şoreşgerî yêñ ku bi berxwedana Mazlûman, bi serhildanê Egîdan, bi fedekariya serokatiyê û bi xwîna hezaran şehîdan hatîye afirandin û ew gavêne riya şoreşa Kurdistanê de hatîne avêtin, wê gelên Kurd bi-be serxwebûnê. Ji ber vê yekê ew kesen şoreşa Kurdistanê bivê pêwist e ku xwedî li vê doz, liv û nirxan derê.

Salvegera neh saliya raperîna 15'ê Tebaxê li gelên Kurd pîroz be.

# Bijî Pazdehê Tebaxê tu her bijî

Pazdehê Tebaxê de heşte û çarî  
Li Dihê dest pê kir serê çekdarî  
Şikandin pozê dijminê xwînxwari  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî.

Di heşte û çaran de hate çêkirin  
Di bin qomuta Agîtê bêmirin  
Li Dihê, Navşanê wan dest pê kirin  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Şer pêşve diçe û pirî bilind e  
Bela dibe li nav bajar û gundan  
Qereqlî kirin wek hîlînê kun de  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Gerîla ji bo şer va ye li karan  
Micalê nade dijmin ew tu caran  
Êrîş birin ser komê neyaran  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Pazdehê Tebaxê bû cejna zanînê  
Jî dijmin distînîn vê heyf û kinê  
Gerîla şer dîkin giş ji bo jînê  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Xortê me şer dîkin ji bona welat  
Jî xwînê sor dîkin ev zinar û lat  
Li meydana şer qet nîn e tebat  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Tebax bûye cejn, halan û dîlan  
Li ber çavê dijmin bû tirs û guman  
Kurdan li her derî serê xwe hildan  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Tebax havînek şîrîn û xweş bû  
Dilê Kurdish iro pê pirr geş bû  
Şîrka gerîla bilind û geş bû  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Gerîla li ser çiyê va ye dibakin  
Emê dijmin ji nav xwe rakin  
Tu car bindestiyê em qebûl nakin  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Pirr pêşve diçe şerê PKK  
Pirr şervan in ERNK û ARGK  
Ew şîrîn di dilê me de gelek e  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Tebaxê bikin eyd û cejna xwe  
Şehîdan tim bînin ser bîra xwe  
Ala rengîn girê din li ser bejna xwe  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

Dilê min xweş bû ez bûm hêvidar  
Kulîlk tevde vebûn va bûye bihar  
Jî qada xwe derxin zîharê koremar  
Biji Pazdehê Tebaxê her dem tu bijî

**M. Salih Alptekîn**

## Dayîka Amed

Va ye paytexta welatêm va ye warê Mîdiya  
Wê dinasin pirr xweşik lê zû de min ew nedîya  
Ev e taca nîştiman im, kaniya xwîna zelal  
Ev e gulgara cîhanê ya me jê hez kiriya

Ay (Melê Kurd) ev e derya de vexwe bi kûlmên tîjî  
Dil û canê xwe tîjî ke, jê bike tim hêviyan  
Ev e Kurdistan dilê min ya tu tim qalê dîki  
Here secdê zû ji bo Amed bi rengê sofîyan

Ferz e sed maç ew li ser min, bidime axa te ya sor  
Ya ku rengîn e ji xwîna pakrewan û kuştiyan  
Lê birêjim hêstiran bo kuştiyan azadiyê  
Şex Seîd, Doktor Fuad û wan şehîd û xaziyan

Sed silav bo te Diyarbekir a lewend û pirr şîrîn  
Ez bi tenha li te mîvan, bende mîna sêwiyan  
Dilşewatê te me Amed pêt û agir têne min  
Ma cîma wa kir li me û te felek û bextê siyan

Ev welatê wek bîhuştê tev çiya û dar û çem  
Sed mixabîn maye kavîl, dilê destê Romiyan!  
Dayê Amed hêj dilê me û te nedîfî vêş û ram  
Tim perişan û bi tirs in li deran wek xwîniyan

Li welatê xwe ne em lê parsek û xwas û hejar  
Qunc bi qunc em digerin her weke bê bav û diyan  
Bi dilopan dide me dijmin, bi enbaran dixwî  
Hê ji bêhiş didine dû van perleman û kursîyan

Ba na sergerdan û gêj be, xweş weke çavan binêr  
Çawa dîrok dilezîne bi çivan wek masiyan  
Serxwebûna vî welati ew e armanca mezîn  
Çi ne takfîkîn beredayî ji bo çend pariyan

Omidar im Ameda min te bibînim serbixwe  
Sûre kelha te bilindir be ji Ehram û çiyan  
Xweş bibe seyran li dor te nav gul û mîrgân di geş  
Bîn bikin hev xort û keç, xweş paledayî bin siyan

Saeta azadiyê hêvî dikim nêzîk bibe  
Ala rengîn xweş li ba be ser sera û xâhiyan.

**Melê Kurd**

## AZADÎ



Abdurrahman Durre

### Rihanî û Gulgezo

**X**wedê rehma xwe li miriyê we bike Ebdi-rehmanê Hesenpaşê (Hasanpaşa, navê gundekî Melazgira Mûşê ye) digot: "Rihanî û Gulgezo li Norşînê (Norşîn navê gundekî Bilîsê ye, jê re dibêjin Norşîna Mala Seyda ji) sabûn çedikirin (sabûnpêj bûn) û sabûna xwe dibirin li Bilîsê difirotin. Rojekê zivistanê disa diçin Bilîsê, li Xana Rehwayê li wan dibe bager, herdu ji di bagerê de dixeniqin, diçin ber rehma Xwedê.

Mele Evdirehmanê rehmetî digot: "Cenazê wan anîn Norşînê ku veşîrin. Keça Rihanî û keça Gulgezo bi ser wan de digiriyan, şîn dikirin, wiha diluvandin: "Sabûnpêj herdu taxan Gulgezo! Ez rebena av û avtêza te me Rihanî." Rehmetî digot ku xelkê ji wan re digot: "Qedera Xwedê ye, negirîn, sebir bikin."

**Süleyman Demîrel ji serokwezîrtî bêxwedî hişt û çû Xana Rehwayê.**

**Xwedê neke ku ew ji dibagera siyasetê de bixeniqe, keça wî ji tune ye ku li ser bigirî û jê re bibêje: "De serê xwe hilde Silêmano, rextê xwe li mil de ez qurban!" Belê Erdalê mozîkê wî, dê li ser wî şîneke giran deyne; pozê xwe yê qotanî dirêj bike, devê xwe yê virtanî gilêj bike û helbestê sozinakî bibêje.**

jê re bibêje: "De serê xwe hilde Silêmano, rextê xwe li mil de ez qurban!" Belê Erdalê mozîkê wî, dê li ser wî şîneke giran deyne; pozê xwe yê qotanî dirêj bike, devê xwe yê virtanî gilêj bike û helbestê sozinakî bibêje: "Sabûnpêj herdu taxa Silêman! Bêdesmêjê şêx û axan ez qurban." Belkî Erdal wî bixe tirba bavê xwe ji, çawa be ew ji baba ye. Divê ku herdu baba ji li ba hev bin, tevî hev bin.

Xwedê hez bike Erbaqan Xoce ji wê telqîna wî wiha bixwîne: "Elînzar û melînzar, min kom dikir te dixwar, min virr dikir sed hezar, te gurr dikir dikir kar, em bi hev re bûn tucar, bi dev dost bûn dil neyîr, oxweş tu bû wekî dar." Xwedê hez bike ku em bigihîjin dema mirina Erbaqan, emê ji telqîna wî wiha bidin:

"Hey virrekê dîngînî, tu bû donê bi tenî  
Bela serê dilsafan, bi fistik û xurafan  
Bendê lingê Silêman, hey El'eman El'eman  
Ji Türkçe û ji Eco, tu bêtîrtir bû Neco  
Hûn tev çêlê guran e, dibêñ ku em bira ne  
Gurê har in hûn hemî, ci hînî bit ci semî  
Roja we reş û heş be, doja we gurr û geş be  
Rehma qalo li we be, para we her ew hebe  
Ez we wilô razî me, ku miftî û qazî me."



Li bakurê Kurdistan  
Li nav dar û daristan

Li ser çiyakî bilind  
Gelek asê xweş û rind

Hebû malbatek jûjî  
Kêm aqil û bêmejî

Şeş çêlî û dê û bav  
Malbatek bi deng û nav

Weke pêt û agir in  
Lê hev û du nagirin

Bavê wan kire xîret  
Bi gotin û bi şîret

Her şeş çêlî dane hev  
Got: "Li min guhdar bin tev

Ku we neyarê xwe dî  
Ji wir bibin nependî

Ger hûn bimînin neçar  
Xwe bikin nava eyar

Bibin wek konek strî  
Dijmin bi we nikarî

Qet xwe nekin pare par  
Pişa xwe nedîn neyar

Em xwe ser hev de herin  
Dijmin bi me nikarin."

Her şeş birayên çeleng  
Qet nekirin his û deng

Ji ber ku nehisguh bûn  
Wan hêlin berdan û çûn

Serhişk in weke pola  
Ketine deşt û çola

Xelas kirin daristan  
Ne bax hiştin ne bostan

Li newal û gelîyan  
Ta êvarî gerîyan

Li wan bû şeva tarî  
Hawîrdor xir û xalî

Tê wan dengê şêr û gur  
Dengê piling û sîxûr

Zur zura hov û hirçan  
Teva eyar rapêçan

# Mar û jûjî

Xwe kirin komek strî  
Bi xof û tirs û girî

Parastina xwe divan  
Ew ji tirsa nalivan

Kund û evor û kovî  
Tütik torîk û rovî

Dikin qajîn li hawîr  
Strî li wan dikin tîr

Heta ku ne bu sibîh  
Qet ne qeliqîn ji cih

Şev bûrî rojê da der  
Xwe derandin ji eyar

Her şeşan dane du hev  
Bi lez û bez û bi rev

Tu nemabû hov û hirç  
Wana bikin par û piç

Bi çavan dîtin mirin  
Qesta hêlinê kirin

Her şeş gihan ber derî  
Bi hev re dane girî

Ji meraqan dê û bav  
Qet ranezabûn bi şev

Dê derî li wan vekir  
Her şeş hewandin hundir

Himbêz kirin yek bi yek  
Got: "EZ nebînim carek

Hûn ji malê werin der  
Bi dizî û bêxeber"

Her şeşan gotin: "Tobe  
Ma tiştê wilo dibe?"

Nema êdî bêxeber  
Em ji hundir nayen der

Tiştê hate serê me  
Nebînin neyarêne me

Em soz û peyman didin  
Em di peyva we de bin"

Roj û mehan da dû hev  
Xebat dikin roj û şev

Dikevin çol û çiyan  
Bi destan û bi piyan

Kom dikin kirş û qalan  
Bi roj û meh û salan

Bûn maldar û dewlemed  
Li hev kirin hol û bend

Hemû parce parce bûn  
Ber guhertin ji hev çûn

Bi hev ketin li her der  
Hev û du re bûn dijber

Roj bi roj û sal bi sal  
Tev ketin jiyanek tal

Lew hate cîranê wan  
Marekî reş wek zihan

Marê reş bi fend û fût  
Ji jûjiyan re bû hût

Ew rojekê ji rojan  
Kete pêsiya bavê wan

Bavê wanî îxtiyar  
Gelek nexweş û hejar

Li nav rez û zeviyan  
Ji xwe re digeriyan

Haya wî nîn e ji mar  
Qevdek ji tirso dixwar

Rebeno ji ku zanî  
Kemîna li pêş danî

Çend gav avêtin meşî  
Marê reş û serteşî

Ji kemînê hate der  
Jûjî kuşt û li wir xwar

Marê bêşerm û fedî  
Nêrî dayîk bêxwedî

Tu der nîn e ku biçî  
Danek têr danek birçî

Li ber hêlinê veket  
Dema dayîk jê derket

Mar mefer jê re nehişt  
Xwe çend kirye ew ji kuşt

Her şeş bira bizdiyan  
Xofa mar ket dilê wan

Li cem mar bi roj û şev  
Ew tim dikin seba hev

Xwe bi hev xayîn dikin  
Xwe bi mar şîrîn dikin

Marê har û bêmirwet  
Bi du her şeş biran ket

Got: "Hê her şeş nebûn yek  
Bilez bilivim carek

Hê ku ji hev re xayîn  
EZ wan bikim firavîn."

Çavê xwe li wan gerand  
Birayê mezîn neqand

Çû raserî hêlinê  
Da ku hat wî bibînê

Kete bin qevdek xweşîl  
Xwe li hev kir kofendîl

Dema jûjiyê bêxem  
Hêdî hêdî giha cem

Wek tîr vebe ji kevan  
Poz lê kire wek heban

Weke pembû perpitand  
Zikê xwe pê werimand

Bira hemû mane şâş  
Mar ji dû wan nade paş

Kete nav wan wek guran  
Heta mane du biran

Nuka bi xwe hisiyan  
Edî ku dor giha wan

Gotin: "Xwelî li me be  
Ne bi vî halê me be"

Bav û dayîka îxtiyar  
Çar birayên wek diyar

Terş û talanê giran  
Ji bo mar bûne qurban

Edî em hev bernedin  
Em li ber xwe lep vedin

Li hember wî marê har  
Em ji hev bûn pare par

Bila neyê serê me  
Wek dê bav û birê me

Emê li mar bigerin  
Tola xwe jê bigerin

Herdu bira derketin  
Li pêşya mar veketin

Mar şêliha tibarê  
Li nêçîrê digerê

Nêrî jûjiyek qelew  
Bi göst û gelek bedew

Xwe ji tibarê berda  
Kar kir herê bi ser da

Jûjiyê din bi dizî  
Ji paş pê ve qelizî

Hê ji cih ne qeliqî  
Jûjî pê ve zeliqî

Duve ew kir devê xwe  
Xwe kişand eyarê xwe

Mar bi şûn xwe ve nêrî  
Li dû wî komek strî

Çiqas mar li ber xwe da  
Jûjî terrî berneda

Pê de çû piço piço  
Heta ku mar bi nîvco

Marê dijmin û xayîn  
Her derêne wî bûne xwîn

Jûjiyan bi serhildan  
Heyf û tola xwe hildan

Rakirin ew bindestî  
Ketin jînek serbestî



Gelî zarokên Kurdan  
Guh bidin Jîr Dilovan

Li hemberî dijminan  
Tim û tim bêberxwêdan

Ev ji bo we çîrok e  
Lê seranser dîrok e.

Vê helbestê ji bo zarokên  
Jîr û zana pêşkêş dikim.

Jîr Dilovan



# Gulleya yekemîn: 15'ê Tebaxê

**Şükrü Gülmüş**

## TIRS U GULLE

Hemû mirov gava ji dayîka xwe çedîbin bi tirs in. Tu kes ne bêtirs e, ne qehreman ne ji egit e. Tirs di nava însan de ye. Weki şev û roj, di nav xwîna me de dilopên sor û spî ne.

Berî her tiştî mirov an tîrsa xwe ditîrsîne an ji, ji tîrsa xwe ditirse. Mirovê ku tîrsa xwe ditîrsîne dibe bêtirs û qehreman... Ên ku ji tîrsa xwe ditîrsin dîbin tîrsonek, revok, şermok... Mirovân zana, mirovê jîr ew e ku, bi ser tîrsa xwe ve here. Dilê xwe bisincirîne. Bergîdana (berdêla) meşa mirovahîye bide ber çavên xwe. Wê hengê mirov mezin dice. Nav û deng dide. Mercen (sert) welatparêziyê pêk tîne.

Weki zanyarê (ilmdarê) me yî mezin, mamosayê me İsmail Beşikçi dibêje: "Hemû mirovân ku jiyanâ xwe di dîliyê de diborînin, hemû mirovân ku di wela-teki mîtingeh de ne; şikestî ne, ketandî ne, tîrsonek in, newêrek in. Mejîyen wan tar û mar bûye. Bedena wan li ser erdê pîj bûye..." Ji bo vê yekê divê bi dengeki mezin rabin ser xwe. Çekeke (sîlaheke) dijwar berbidin tîrsa xwe. Mamosayê me ji me re diyar dike ku: "Mirovân Kurd, mirovân şoreşger gulleya yekemîn berbidin tîrsa xwe, ya duyemîn berbidin dijminê xwe." Mirov he-ta vê biryare bide, pîr û pîr difikire. Lî gava biryara xwe bide weki lehiyê divê nesekine. Li dû xwe nenêre.

## GERÎLA Û ÈRÎSA MEZIN

Dema ku 12'ê İlonê hat, sa-zûmaniya hikmî faşizmî li Tirkî-yeyê serdar bû. Çepen Tirkan û tevgerên wan hilweşandin. Pirra-niya wan xistin zîndanan. Parti-

ya Karkerêne Kurdistanê (PKK) tu carî teslim nebû. Hêzên xwe kişandin serê çiyan. Èrîşî leşkerê Romê kirin. Li hember faşistan têkoşîneke giran dan. Ji pêşeng, endam û hevalbendên PKK'ê gelek şehîd ketin. Hinek ji wan dîl ketin. Weki Kemal Pîr, Maz-lum Doğan, Hayrî Durmuş û hwî. gelek mirovân hêja keleme-çe li destêne wan hate xistin. Ji bo vê yekê PKK'ê dest bi rîcatê -pêgavek bi paş ve avetînê- kirin. Li Sûriyê, li Îranê, li Iraçê, li Lubnanê civiyan. Li cem Filisti-nîyan hêvoja (perwerdehiya) leşkerî hîn bûn. Ji sala 1980'ê heta sala 1982'yan kişîyan derve. Kongreya 2. çêkirin. Biryara 've-gera welat' dan. Hinek tîrsonek û newêrek li hember vê biryare derketin. Ger vekirî, ger sergirtî. Wek Bakî (Sileyman) 6 mehan nehiştin ku gerîla bikevin nava welêt. Dest danîn ser. Komika wan ji aliye serokatiyê ve hate felişandin. Gerîla ketin nav axa welatê xwe, ketin nava gelê xwe.

Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) ava bû. HRK'ê hazırlîyeke mezin dikir. Wezîfeya wan; rîexistin, şerkirin, propaganda û cezakirina xinîz (xaîn) û sîxuran (mixbîr) bû. Birêxistina PKK'ê û hemû kelemîn li pêsiya meşa azadî çi hebe, hedef û armanca wan bû. Sîleh, mihîmat, gulle, peyde dikirin. Mirovân nû didi-tin, têkili bi wan re datanîn.

Qumandarê li ser wan Egît Mahsum Korkmaz bû. Keşîf, iştirîbarat, û hemû lêkolînên xwe qedandibûn. Di 15'ê Tebax 1984'an de èrîşî ser Dihê (Eruh) û Navşanê (Şemzinan) kirin. Qurme qurma keleşan, şewqa bazûkan û dengê otomatîkan guh kerr dikirin. Leşkerêne Tirkan bêgülle mirin. Di nav deme-ke kin de herdu bajarêne Kurdis-

tanê di destê gerîlayan de bûn.  
**NAV Û DENGÊ MEZIN**

Li gorî planan gere li Şaxê (Cetax) û çend cihêne din ji èrîş pêk bihatina. Sazûmana faşist digot: "Me êdî pişta PKK'ê şikand. Careke din nikare serê xwe rake." Lî belê radyo, TV û rojnameyên wan tifi ser çavên wan dikir. Weki şeqaman gotin li rûyê wan dixistin: "Ka we PKK nehiştibû? Ev ci rewş û zewal e?"


Èrîşâ Dihê û Navşanê; gulle-ya yekemîn bû!.. 15'ê Tebaxê; serhildan û raperîna gelê Kurd û Kurdistanê!.. Ew roj cejna nete-weya Kurdistanê!.. 15 Tebax; pêgava meşa azadiyê!.. Bi qu-mandariya Egîte qehreman. Bi şerê gerîlayan rojek taybetî yel..

Dost keniya, dilkweş bû. Dij-min lerizi, pernişî û ket ber zeke-ratan. Dinya bi xwe ji bi şerê gerîla hesiya. Navê wê rakirin: "Ew êdî ne terorîst in... Ew rast bi rast gerîla ne, gerîla!" Careke din ji Serokê Partiya Karkerêne Kurdistanê Abdullah Öcalan, direkt rast dikir. Mafên pêşenga-teslim dikir.

Dîroka dînyayê daye naskirin; gelên bindest ên ku di bin nîrê koletiyê de ne gere bi şerên çek-darî serfiraz bibin. Çinê bindest ên ku kedê dikin lê belê keda xwe naxwin bi darê zorê rîzgar dibin.

Gelê Kurdistanê di dîroka xwe de pîr têkoşiyaye. Gelek caran serî hîldaye. Weki Feradê xwîn rijandiye, weki çiyayê Cûdi ji cendekê Kurdan çiyayan ava kîrine. Ew ji, ji bo azadî û serx-webûnê ne bes bû.

Berî her tiştî ji şervanên cîger pola lazim in. Di gel dijmînekî mezin, artêseke xwînxwar, artêşen gelêri pêwist e. Hemû hosteyen şer dibêjin: "Artêşa dewletê mîna fil e, gerîla mîna



Mahsum Korkmaz (Egît), di 28'ê Adara 1986'an de li Çiyayê Gabarê şehîd ketibû.

moristangan e." Rast e... Fil mezin e. Bi saw e. Qilafetê wê mirov ditîrsîne. Lî damareke wê ya qels heye. Ew ji gava bikeve tu carî nikare rabe ser piyan. Çökên wê dişkîn. Bedena wê giran e. Li erdê wek termekê di-mîne. Moristang biçük e, kare bikeve guhê fil. Bikeve pozê wê. Ji wir xwe bigihîne mejiyê wê. Wê dîn û har bike.

İro em di bîranîna sala 10. a 15'ê Tebaxê de ne. 10 sal e ku şerê çekdarî roj bi roj mezin dice. İro qumandarê mezin Egît Mahsum Korkmaz ne li nav me

ye. Lî navê xwe da akademiyê. 10 hezar mirov ji akademîya wî mezûn bûn. Hew qas ji di nav welatê Kurdistanê de akademî ava bûn. "Ji 15 mirovan em gi-hîstîn 15 hezar mirovan." Kesî berê newêribû ku bîbêje, "Ez Kurd im". İro zarokên Kurdan dibêjin, "Biji Kurdistan... Biji èrî-şa 15'ê Tebaxê ...Biji Egît..."

Rojek wê bê, moristang zikê fil qul bike.

Rojek wê bê, zarokên di zikê diya xwe de bîbêjin:

"Nesekinin!... Nesekinin!... Va em hatîn!.."

## Merheba hevalê min, merheba Egîte min

Weki iro tê bîra min. Rojeke havînê bû. Kele kela germê bû. Xopana Elihê (Batmanê) dikiliya, mîna ava li ser agir difuriya. Havîn; germ, toz û dûman... Zivis-tan; serma û teres, baran û zîbik, li ser serê me feqiran bû. Gundekî biçük bû. Navê wê iloh bû. Pişti wê bû Elih... Kê ew nav lê kir? Tu kes ji nizane? Elih, kîrin Batman!.. Qeymeqamek hat. Got "Nabel.. Gere navê Batman bê gorandin. Bibe Petrokent"... Kir û nekir Batman ji "xişte xişte" nehat xwarê. Nebû Petrokent. Petrol a wan bû. Derd û elem a me bû. Kêf û kêfxweşî tim û tim li cem wan bû. Xem, keder û xemgîntî birayê me bû. Em bi-hev re dijin. Der û dorêne safgehê (rafinerî) bi têlê rîsayî girtin. Gotin, ji za-rokên mîhelan re "Yasaxxi!..."(qedexe)...

Em xort bûn, "yasax masax" me nas nedikir. Deh, pazdeh mirov li pişta he-wuza sîteyê, li bin siyên darê civiyan. Mazlûm, serekvan û mamosayê me bû. Dersên şoreşgerî nîşanî me didan. Ci-vînê jorbin me dikirin. Yek bi yek soz da me. Di bernameya me yî peşîn de; mişkulanî tevgerên şoreşgerî bûn. Her-kekîn kevneperek û hovîş nedixwestin ku, me bitîrsîn û bela bikin. Geh bi dizî, geh bi aşîkarî devê çekên xwe nîşanî me didan. Herkes li gorî xwe fîkren xwe diyar dikirin. Dor hatîbû ser Mahsum; Mazlum: "Sen ne diyorsun arka-daş?" (Tu ci dibêjî heval?)

Bêhemdi çavên me hemûyan cûn ser Mahsum. Hemû hevalan meraq dikir ku, Mahsum wê ci bîbêje. Mahsum, li der û

dora xwe nîrî. Keniya. "Ez dibêjîm ku... Ez dibêjîm ku, êdî li wan kevneperestan em vegeerin. Çend rojan ji berjêr de çend gulleyan berî wan bidin..." Mazlum, serê xwe hejand. Civîna me xelas bûbû. Em sisê, çar, belav bûn. Min wê çaxê nû Mahsum dîtbû. Ez, Mazlum û hevalekî din bûn. Peyvîn Mahsum li ber guhê min bûn. Tu çekên me ji tune bûn. Min ji Mazlum re got: "Ev heval kî bû?" Mazlum, li nava çavên min nîrî. Wekî ku bîbêje: "Min çend cara ji te re got. Tu carî tiştîn wiha nepirse." Qasekê sekînî, "Ev heval pişti ku tu çûyi ket nav koma me. Navê wî, Mahsum Korkmaz e. Hîna lîse dixwîne. Hevalekî baş e. Rast ji dibêje. Lî, çekê me tun in."

Mahsum, kin û xurt bû. Mîna parçekî

pola bû. Çavên wî diçûn û dihatin. Destê wî tu car nedisekinin. Pirr hereket dikir. Ez fikirîm, "Ji vê gavê ve GîAP'ê me belî dibin. Di quncikê dilê min de Mahsum ci-hekî pêwist girt. Me hevdu nas kir. Gelek xwîşîrin û dilovan bû. Her tiştî xwe bi hevalê xwe re pişk dikir. Mal û malbata wan xurt bû. Tim pereyên wî hebûn. Ji bo wê yekê, pereyê çay û xwarînen me tim wî dida.

Em ji cih û warekî bûn. Ji bo azadî û serxwebûnê ji hev belav bûn. Taliya ku min wî dit, ew diçû binxetê, ez dihatim serhetê. Ew bû qomutanekî pirr bi rûmet. Ez bûm, girtiyekî têkôşer. Ew li serê çiyan bû. Ez li nava zîndanan bûm. Weki iro, ez te tu car ji bir nakim hevalê min, Egîte min. Ez te ji bir nakim...

welat

- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.